

Jozef Czapski: Wênesaz û Nivîskar

Dema mirov endamê civakeke bindest be û li gorî pergala serdestên xwe di çerxa perwerdeyê re derbas bûbe, bivê nevwê ji hişmendiyê bigire heta tevgerên xwe yê jiyani li gorî wê pergalê teşe digire. Mirovê bi navê Jozef Czapski... **Yaqob Tilermenî / R.5**



Têkildarî Mihemed Arif çend pirs

Me xwest ku ew Mihemed Arifê ji aliyê gelek kesan ve bêtir weke stranbêjê eşqê û tenê li ser dilan kilam gotine derdikeve pêş, bi çend pirsan ji kilam û stranên wî wêdetir, li ser ked û hezkirina wî ya kurdî û welêt bisekinin... **Mefer Kurdî / R.11**



xwebûn

30 MIJDAR-6 KANÛN 2020 HEJMAR: 50 BUHA: 4 TL rojname@xwebun.org

Fêmanakin û nezanin

Bi dehan sal in dewleta tirk ji bo zimanê kurdî tune bike her tiştî dike û li hemberî vê yekê kurd jî bi bedelên giran hebûna zimanê xwe diparêzin. Gelek caran bêhurmetiyê li zimanê kurdî dikin. Midûrê Karên Nivîsan ê Rojnameya Azadiya Welat ku bi KHK'ê hatibû girtin, Îsmail Çoban niha girtî tê

darizandin. Ji ber nûçeyên di rojnameyê de hatine veşandin doz li Çoban hatiye vekirin. Di danîşîna dozê de Çoban xwest bi kurdî parastina xwe bike lê axaftina wî wekî; 'Hat dîtin ku bersûc pirsên tirkî yê serokê dadgehê, bi zimanekî nayê famkirin bersivandiyê' derbasî qeyd û girtekan kir... **R.3**

Korona barê mayînde ye

Pandemiya korona di gelek astan de stres çêkiriye, lê hêjayî gotinê ye ku berfirehiya encamên pisikososyal ên demdirêj dê tenê di mehên pêş de pêk werin. Ji ber şewba Kovîd-19'ê, zirara hestên mirovan, tevlihevî û nîşaneyên fikaran derdikevin pêş. Ji destpêka kirîza koronayê ve, raporên nexweşiyên têkildarî teşhîsên derûnî zêde bûne. Stresa psikolojîk dikare ne tenê bi nîşaneyên psikolojîk ên wekî fikar an depresiyonê, lê di heman demê de di forma giliyên fizîkî de jî xwe bidin der. Di heman demê de ew dikare xwe bi nîşaneyên laşî yê mîna stresa hestiyar, dilketin, kurtbûna bêhnê, tengasiya sîngê, giliyên gomestestînal, gejbûn, serêş û nexweşiyên xewê bide xuyakirin. Mirovên ji bo wan empatî hêsantir e, bi gavên berbiçav ên koronayê baş dibin... **Abdulillah Polat / R.8**



Kujerên Tahîr Elçî tên parastin

Serokê Baroya Amedê Tahîr Elçî di 28'ê mijdara 2015'an de li Amedê dema li ber Mînareya Çarling daxuyani dida hat kuştin. 5 sal derbas bûn û hê jî kujerên Elçî nehatine darizandin û edalet pêk nehatiye. Elçî beriya ku were kuştin çend roj berê di bernameya rojnameger Ahmet Hakan Coşkun de ji ber ku gotibû 'PKK rêxistineke terorîst nîne' hedef hatibû nîşandan.

Welat dest bi weşanê kir

D Rojnameya Welat ku di sala 2018'an de bi KHK'ê hatibû girtin, bi awayekî dijîtal dest bi weşana xwe kir. Komek rojnameger ji bo berde wama weşana rojnameya Welat li hev civiyan û bi awayekî dijîtal bi manşeta "Dem dema azadiyê ye" dest bi weşana Welat kirin. Rojnameya Welat wê her roj tenê rûpela yekemîn amade bike û bi awayekî dijîtal biweşîne. Ji her çar parçeyên Kurdistanê û dîsporayê wê nivîskar ji rojnameyê re di mijarên cuda de nivîsan binivîsin. Li ser malpera rojnameyê wê arşîva rojnameyên kurdî yê ji salên 1990'î heta niha hatine veşandin jî bîn dayîn... **R.3**

Hişê azad û neteweya azad

Ziman tiştên hişê mirovan derdixîne holê. Hişê mirovan bindest be, bêguman wê ziman her tim bindestiya mirovan derîne derve lê heke hiş azad be, dîsa bêguman wê ziman her tim li gorî azadiya hişî tevbigere û wê azadiya hişî derîne derve. Heke hişê mirovê xwe ji bindestiyê rizgar nekiribe, helbet ziman wê nikaribe behsa azadiyê bike. Lewma em dikarin bêjin ku bindestiya hişî yan jî azadiya hişî rê nîşanî zimanê mirovan dide û li gorî wê ziman gotinên xwe çêdike. Ji ber ku ziman li gorî hiş tevdi-gere ango gotinên hiş bi zimên tene gotin... **Hisên Çatikkaş / R.6**

Şêrko êdî di kurmançî de ne Bêkes e




Nivîskar û wergêr Muhşin Ozdemir navê xwe bi wergerên xwe yê helbestên ji zimanê farisî ên Furûx Ferrozadê û Sohrab Sepehrî, her wiha romana Sadiq Hidayet a bi navê Bûmê Kor da bihîstin. Her wiha we navê wî ji veguhastina helbestên Şêrko Bêkes ji zaravayê soranî bo kurmançî jî bihîstiye. Ozdemir wiha axivî: "Bi xeyala ku bibim pîrek di navbera zaravayên kurdî de, min wergerandina-kurmançîkirina zaravayê kurdî-soranî jî ji xwe kir armanc. Îro sed hezaran kurmançixêv Şêrko nas dikin, dixwînin, an dizanin. Di vir de helbet têkariya me jî ne hindik e..." **Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4**

AGÛT YAZAR

Zêr zane zor zane devê tivinga mor zane!... **R.12**

Erdogan nêşkeno reforman virazo

Referandûmê 2017 de pergale yew kesî sey dermanê heme çî, sey çareserîya heme probleman bi civatanê Tirkîya dîya qebulkerdîş. La no pergale peynîyê 2 seran de rijîya. Erdogan û hevalbendê xo binê xirbê cê de mendê û hewar kenê. Belê, 18 seran de Erdoganî qabê pawitîş û dewamkerdişê iqtîdarê xo zaf bedelî dayî, zaf hevalê xo kerdî qurban, zaf fetlî û fêti çarnayî. La wina aseno ke redkerdişê... **Mehmet Şahin / R.9**



Gelek kes hatin binçavkirin

Li dijî welatî, kesayet, siyasetmedar û sazî û rêxistinên sivil ên civakî bênavber operasyonên pêla binçavkirin û girtinê pêk tînin. Li ser fermana dozgeriyar li hin bajarên polîsan bi ser malan de girtî û gelek kes binçav kirin. Polîsan di serdegirtina malan de kelûpelên welatîyan jî serûbin kirin... **R.3**

Wezîra Çand, Dekolonîzasyon û Depatriyarkalizasyonê

Herî dawî di 20'ê mijdara 2020'an de li welatê Amerikaya Latîni Bolîvyayê Sabina Orelana bû 'Wezîra Çand, Dekolonîzasyon û Depatriyarkalizasyonê'. Li gel taybetiyên wezaretên li Amerika û Zelandaya Nû, wezaretê li Bolîvyayê bi gelek awayan ji mînakên din balkêştir e. Lewre ne tenê yekem car e jineke xweçihî di nav wezaretê de

cihê xwe digire, di heman demê de ev wezaret bixwe di cihanê de mînaka yekemîn û yekane ye. Ji xeynî Bolîvyayê li tu devera cihanê wezareteke bi vî navî tune ye. Ev wezaret bi armanca geşkirina çandên xweçihî, tunekirina bandor metîngeriyê û jî holê rakirina bavkîsalariyê hatiye avakirin. Di pênasekirina vê wezaretê de... **Munewer Azizoglu Bazan / R.2**

'Destê Homayî'

D Vatişê verînan o, "Wa destê Homayî paştîya to de bo". Wexto joy qeybî joy bîni başîke waştêne ana vatêne. Zehfê cê zî dadiyan qewbî tutanê xo vatêne "Wa destê Homayî paştîya to de bo." Tutekê bibî, çayke dîr de, babî feqîr, keyede nîzde dûzî-neyke tutî. Ê ma zî zehfê keyan de endêke tutî bibî. Erê Diego Armando Maradona roja 25.11.2020'an de qelbê cê reya peyîna da pero û nîvîndert. Hendî Maradona ene dînya de nîyo. Maradona şî. A Maradonayo ke lehengê tutanê ma, lehengê zehfê tutan bî. A Maradonayo ke qîc, pîl, her kesî bi kêf ro maçanê cê temaşe kerdêne... **Cemil Oguz / R.9**

Rastiya ku bi koronayê re derket holê!

Navenda Nûçeyan

Bandora vîrûsa koronayê ya salek berê li Çînê peyda bû û li hemû cîhanê belav bû, didome. Ji roja ku vîrûs belav bûye heta niha, gelek welat ji bo vîrûsê bixin bin kontrola xwe gelek tedbîrên cur bi cur digirin. Yek ji van tedbîran jî qedexeya derketina derve ango mayîna li malê ye lê ev tedbîr di nav salekê de bi xwe re pirsgrêke cidî jî derxistin holê; yek ji wan jî tundiya li nav malê ye.

Ji roja ku tedbîrên ji bo korona zêde belav nebe û nebe sedema mirina mirovan hatine girtin, tundiya li nav mal/malbatê û bi taybetî tundiya li ser jinan derketiye asteke jor. Bi carekê tundiya li ser jinan ji sedî 30-40 zêde bû. Dibe ku ev rêje hîn zêdetir be.

Piştî zêdebûna tundiya li ser jinan li gelek welatan, ji bo pêşilgirtina tundiya torên piştvanîyê hatin avakirin û qaşo gelek welat jî hin qanûnên xwe guhertin. Ev guhertin pêşiya tundiya negirt, berovajiyê vê tundî her çû zêdetir bû.

Di nav salekê vîrûsa koronayê de di serî de Kurdistan û Rojhilata Navîn, li hemû cîhanê tundî û qetilkirina jinan a ji aliyê mêrên ku bi qanûnên serdestan têne parastin, zêdetir bû. Her roj tundî li jinan tê kirin û jin tên qetilkirin.

Bi taybetî li bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê, her roj bi dehan jin rastî tundiya tên û tên qetilkirin. Têkildarî vê mijarê tu tedbîrên rayaderan tune ne berovajiyê vê hikûmeta heyî hewl dide bi guhertina qanûnan, tundiya li jinan zêdetir bike û mêrên tundiya li jinan dikin û wan qetîl dikin ji bi qanûnan wan diparêzin.

Daneyên UN Womenê

Têkildarî mijarê Rêxistina Jinê ya Nete-weyên Yekbûyî (UN Women) daneyên tundiya ya 2020'an parve kiribû û li gorî daneyan tundiya li ser jinan bi şewbê re gihiştîye asteke bilind.

Li gorî daneyên UN Womenê (Netewe-

Divê jin tu carî baweriya xwe bi qanûnên mêrên serdest neynin ku dixwazin wan tune bikin û divê jin li her qada jiyane mekanîzmaya parastina xwe bi xwe saz bike, ji bo xwe û civakê biparêze

yên Yekbûyî Jin) ku dawîya meha îlonê aşkera kiribû, bi qedexeyên têkildarî koronayê re li gelek welatan bûyerên tundiya tên li dijî jinan û giliyên ji ber tundiya ji sê paran yek zêde bûye.

Di raporê de hate ragihandin ku rêjeya tundiya li jinan li Sîngapûrê ji sedî 33, li Fransa û Qibrîsê ji sedî 30 û li Arjantînê jî ji sedî 25 zêde bûye.

Li gorî daneyên UN Womenê di dema şewbê de li Afrîkaya Başûr û Nijeryayê bûyerên destavêtina li jinan zêde bûne û li Perûyê jî windakirina jinan heye. Li Brezîlya û Meksîkayê bûyerên kuştina jinan zêde bûne.

UN Womenê destnîşan kir ku astengiyên derketina derve yek ji ber şewba Kovîd-19'ê jiyana jin û zarokan bêewletir kiriye û li gorî vê yekê jin li mala xwe girtî dimînin û dibin hedefa tundiya.

Li gorî texmîneke cuda ya Neteweyên

Yekbûyî, hişyarî hatibû dayîn ku bûyerên tundiya tên di dema şewbê de 30 milyon zêde bibin.

Mekanîzmaya xweparastinê

Di rapora UN Womenê de ku du meh berê hatibû aşkerakirin, hat diyarkirin ku tundiya li ser jinan tu demê kêmbûyê, her diçe zêde dibe û bi koronayê re jî ev tişt derket holê.

Di vê mijarê de tişt ku divê jinên cîhanê bikin ev e; divê jin tu carî baweriya xwe bi qanûnên mêrên serdest neynin, ji ber ku mêrê serdest ku her demê dixwaze jinan têk bike tu carî ji bo ewlehiya jin û zarokan qanûnên xwe naguherîne berovajî dê her tim qanûnên xwe li gorî bêparastinhiştina jinan çêbike; divê jin li her qada jiyane mekanîzmaya parastina xwe bi xwe saz bike, ji ber encax jin dikarin bi mekanîzmaya xwe, xwe û civakê biparêze û pêşî li êrişan bigire.



Di 29 salan de 20 hezar jin...

25'ê Mijdarê Roja Têkoşina li Dijî Tundiya li Jinan di serî de li Kurdistanê li her dera cîhanê bi çalakiyên cur bi cur hat pêşwazîkirin. Wê rojê rêxistinên jinan tundiya li ser jinan û berxwedana jinan a salekê aşkera kirin.

Li başûrê Kurdistanê jî ji bo 25'ê Mijdarê çalaki hatin kirin. Di çalakiyan de jinan daneyên tundî û qetilkirina jinan parve kirin. Grûba Wijdanê jî têkildarî tundiya li jinan

daxuyaniyeke nivîskî parve kir.

Li gorî daxuyaniya Gruba Wijdanê li başûrê Kurdistanê piştî rapêrîna sala 1991'ê ve tundiya li ser jinan zêde bûye û zêdetirê 20 hezar jin bi hincetên cuda cuda hatine qetilkirin.

Her wiha di daxuyaniyê de bang li jinan hat kirin ku divê têkoşina li hemberî tundiya were xurtkirin û êdî tundî li jinan neyê kirin. **SILÊMANÎ**

Li dijî newekhewiyê wezareteke nû

Cara yekem li cîhanê jinek niştetich û cotkar a li Bolîvyayê ku di nav tevgera jinên pêşeng de cih girtiye, bû Wezîra Wezaretê Çand, Dekolonîzasyon û Jiholêrakirina Serdestiya Mêran a Bolîvyayê.

Sala borî li parlamentoyê yekgirtina partiyên rastgir û çepgir bi darê zorê kir ku serokê dewletê Evo Morales îstîfa bike. Piştî hilbijartinên pêşwext partiya Morales MAS (Tevgera Ber Bi Sosyalîzmê Ve) bi ser ket. Piştî ku Luis Arce wek serokê dewletê hat hilbijartin û kabîneya nû aşkera bû, wezareteke nû hat damezirandin.

Li gorî daxuyaniya Alîgirîya Berpirsê Serokê Ragihandina Bolîvyayê, wezaretê navê wê "Çand, Dekolonîzasyon û Depatriarkalizasyon (Jiholêrakirina Serdestiya Mêr)" e xwediyê erka teşwîqkirina polîtîkayên çandî yek der barê xîret û serweriyê de û jiholê-

rakirina newekheviya di navbera gelan de ye.

Serokê dewletê Arce der barê erka wezaretê de ev tişt got: "Ji holêrakirina mêtîngerî û bavkîsalariyê, newekheviya navbera gelan û her wiha ya navbera jin û mêran de şikandina nêrîna hegemonyaya yekdengî ye."

Jina têkoşer Sabîna Orellana di heman demê de temsîlkara Konfederasyona Neteweyî ya Jinên Gundî û Niştetichên Bolîvyayê ye. **AMED**



Biyayn

Munewer Azizoglu
Bazan

Ministra de Culturas, Despatriarcalización y Descolonización

Meha mijdara 2020'an, ji xeynî 25'ê Mijdarê bi çend mijarên balkêş, bi hêvî, ji hev dûr û girêdayî hevdu ket rojeva jinan û jiyane. Çend bûyerên ku çend kevîrên hezar salan ji cihê xwe dineqîn û de tu carî nehêlin ji nû ve xwe li cihê xwe yê kevin asê bikin.

Hilbijartinên serokatîyê yek li Amerîkayê di meha mijdarê de bi gelek awayan mohra xwe li rojeva cîhanê xist. Yek pêşketeke di vê hilbijartinê de derketê pêş jî hilbijartina Kamala Harris bû. Kamala Harris li gorî encama derketiye holê dê bibe Wezîra Karê Hundiirîn a Amerîkayê lê ev kar û berpirsiyariya Harris di hemû çapemeniya cîhanê de bi çend taybetiyan hat xemilandin: Harris wek yekem jin, yekem reşik, yekem kesa bi kokên tamîlî û jamaîkî dê bibe Wezîra Karê Hundiirîn a Amerîkayê.

Çend roj piştî hilbijartinên Amerîkayê li Zelandaya Nû Nanaia Mahuta di dîroka vî welatî de cara yekem wek

jineke ji xwecihên Maorî bû Wezîra Karê Derve ya Zelandaya Nû. Nanaia Mahuta ji peywir û berpirsiyariyên xwe zêdetir, bi deqên (bi zimanê Maorî: Moko Kauae) li ser çeneya xwe ku wek nasnameya wan a eşîrî tê dizanîn, di çapemeniya rojavayî de cihê xwe girt.

Herî dawî di 20'ê mijdara 2020'an de li welatê Amerîkaya Latînî Bolîvyayê Sabîna Orellana bû 'Wezîra Çand, Dekolonîzasyon û Depatriarkalizasyonê'. Li gel taybetiyên wezaretê li Amerîka û Zelandaya Nû, wezaretê li Bolîvyayê bi gelek awayan ji mînakên din balkêştir e. Lewre ne tenê cara yekem jineke xwecihî di nav wezaretê de cihê xwe digire, di heman demê de ev wezaret bixwe di cîhanê de mînaka yekemîn û tekane ye. Ji xeynî Bolîvyayê li tu devera cîhanê wezareteke bi vî navî tune ye. Ev wezaret bi armanca geşkirina çandên xwecihî, tunekirina bandorên mêtin-

geriyê û ji holê rakirina bavkîsalariyê hatiye avakirin. Di pênasekirina vê wezaretê de bal li ser newekheviya navbera welatan/neteweyan û zayendan (jin û mêr) tê kişandin. Li hêla din ev wezaret bi navê xwe tîkiliyên mêtîngerî û bavkîsalariyê û bandora wan a ser çand, jin û gelên xwecihî yekser dide der.

Her sê jin di daxuyaniyên xwe de helwestên xwe jî anîn ziman: Orellana got ew ê di wezaretê xwe de hewl bide ku nijadperestiyê bi hevjiyana aştîyane ji holê rabike, wateya ala Whipala (ala xwecihên Bolîvyayê) ji bo nîşanê niha fêmar bike. Bi vê hîzrê, ew ê li ser avakirina welatekî ku bi rehên xwe serbilind e û kevneşopiyên çandî yek rojhilat û rojava, gund û bajar diparêze, bisekine. Mahuta di axaftina xwe de behsa rewşa jinên Maorî kir û wiha got: "Ev ji bo min şanaziyeke mezin e. Ez jî yek ji wan gelek jinan im ku cara yekem tiştêk bi ser xistin û ez hêvî dikim dê jinên

Maorî yek din ji min îlhama bigirin." Ligel wan Harris xwest balê ji ser xwe rake û got: "Ji bo min a pêwîst giyana Amerîkayê ye."

Ger mirov her sê mînakên jorê bîne gel hevdu ji hêla helwest û rewşa jinên hilbijartî ve dibe ku gelek xalên hevpar derkevin pêşberî me lê li hêla din, rola wezaretên karê hundirîn û derve ku yek ji sazîyên bingeheîn ên netewe-dewletan in, ji rol û peywira wezaretê ku dê Orellana li Bolîvyayê bibe ve bibe, gelek cudatir e. Bêguman di nasnameya Harris û Mahuta de dewletên mêtînger ên wek Amerîka û Zelandaya Nû neçar dimînin ku ciherengiya axa ku lê serdestiyê dikin, nas bikin. Ev nasname ne ji tîkoşînê niştetichan û jinan, ne ji ji krîza sîstemê û ji lêgerînê ji krîzê derketinê azad e. Ya Wezaretê Çand, Dekolonîzasyon û Depatriarkalizasyonê di bin berpirsiyariya Orellana de cudatir dibe ev e: ne ji bo krîza sîstemê re bibe çareser lê ji

bo wê hilweşîne hatiye damezirandin.

Baweriya ku em dibêjin sedsala 21'emîn dê bibe sedsala azadiya jinan bingeha xwe ji vê pêlê digire. Di hilbijartinê her sê jinan de jî tîkoşina jin û gelên rêxistinîkirî -dîtî û nedîtî- roleke girîng dilîze. Yek van pêşketevanan dê mayînde bikin û "jinên bihêz" bi "hêza jinan" sertac bike jî dîsa asta rêxistinîbûyîna jin û gelan e. Orellana di axaftina wergirtina peywira xwe de balê kişandibû ser rola jinan a ji bo vê peywirê û bindestkirina wan: "Bifikirin ku rêveberiya vê wezaretê ji bo me, ne-maze ji bo jinên xwecihî, zehmetiyek mezin e. We (mêr) her gav em jin kêmbûn û kêmbûnê kirin." Niha ew jinên kêmkirî û kêmbûnê li seranserê cîhanê dîroka çewtkirî sererast dikin û ya niha jî bixwe dinivîsin. Nema êdî payeyên serdestan reng û deqên jinan/xwecihan di nav xwe de wenda bikin. Tenê divê ew xwe bispêrin hêza jinan/niştetichan û ne ya serdestan.



Rojnameya Welat dest bi weşanê kir


Rojnameya Welat ku di sala 2018'an de bi KHK'ê hatibû girtin, bi awayekî dijîtal dest bi weşana xwe kir.

Komek rojnameger ji bo berdewama weşana rojnameya Welat li hev civiyan û bi awayekî dijîtal bi manşeta "Dem dema azadiyê ye" dest bi weşana rojnameya Welat kirin. Rojnameya Welat wê her roj tenê rûpela yekemîn bê amadekirin û bi awayekî dijîtal bê weşandin.

Ji dîaspora û her çar parçeyên Kurdistanê de nivîskar ji rojnameyê re li ser mijarên cuda binivîsin. Xebatkarên rojnameya dijîtal ragihandin ku di hejmarê ewil a rojnameyê de nivîsa Gulê Algunerhan, Ahmet Aktaş, Cûmalî Dogan, Zeynep Guner û Fehîm Işîk heye. Her wiha ji parêznameyên Abdullah Ocalan nivîsek hatiye amadekirin.

Dê li ser malpera rojnameyê arşîva rojnameyên kurdî yê ji salên 1990'î heta niha hatine weşandin, bîna dayîn. Di rojnameyê de nivîseke edîtorîya rojnameyê hatiye dayîn ku tê de behsa pêvajoya destpêkirina rojnamegeriya kurdî û weşangeriya li dor navê Welat hatiye kirin.

Her wiha çend roj berê xebatkarên rojnameya kurdî ya dijîtal erojnameyê ragihandin ku weşana xwe bi dawî kirine. **AMED**



Lihêfa mafên jinê

Hunera jinan gelek caran balê dibe ser civakîbûna jinê jî. Ew hem bûyer û rewşan dibîne hem jî li ser wan dihizire. Ev lihêfa neqîşandî jî berhemeke wisa ye ku ji sala 1875'an maye. Navê berhema Emma Civey Stahlê, Lihêfa mafên jinê (Woman's Rights Quilt) ye.

Hunermend di berhema xwe ya tekstîlê de bi du çirokên cihê dadikeve. Ji çarçikên neqîşandî sê ji wan behsa leşkerên di Şerê Navxweyî yê Amerîkayê de şerkirine dike. Gava ku ev lihêf hatiye çêkirin, birîna vî şerî hê nekewiyaye.

Sê çarçikên din ên neqîşandî jî li ser çalakgeriya civakî ya ji bo mafên jinan in. Di yekê jî wan çarçikan de jina reformxwaz nişaneke "Mafên jinê" bi ser milê xwe ve berdaye û beramberî zarok û hevjinê xwe disekine. Di çarçikeke din de jina reformxwaz bi erebeyeke hespan ber bi menzîlê ve diçe. Ew menzîla wê jî di çarçika li cemê ye: Civîneke ku ew bi kelecana ji xelkê re dipeyve. Li ber destê me hunermendê lihêfçêker heye ku nihêrîna xêzeromanî ya jinekê li yekê jî babetên siyasî yê herî cidî yê dawîya sedsala 19'an li ser lihêfêkê xêz kiriye. Lihêf sala 1875'an li bajarê Illinoisê hatiye çêkirin û îro li Met Museuma li New Yorkê tê nişandan.

Çavkanî: Yenî Ozgur Politika

Kurdî hê jî 'zimanê nayê fêmkirin' e!

Di dadgehên dewleta tirk de kurdî hê jî 'zimanê nayê zanîn' e. Di danîşîna doza rojnameger Îsmail Çoban de serokê dadgehê kurdî wekî zimanê nayê famkirin derbasî girtekan kir. Dadgehên dewleta tirk di dozên KCK'ê de jî heman tişt gotibûn

Dehan sal in kurd ji bo zimanê xwe têdikoşin lê hê jî dewleta tirk zimanê kurdî nas nake. Piştî ku qeyûm tayînî şaredariyan kirin, karê ewil rawestandina xebatên kurdî û rakirina tabelayên kurdî bû.

Midûrê Karên Nivîsê yê Rojnameya Azadiya Welat a ku bi KHK'ê hatibû girtin, Îsmail Çoban bi îdiaya "Rêzpropagandaya rêxistinê kiriye" doz lê hatibû vekirin û niha girtî ye. Der barê Çoban de ji ber 9 nûçeyên cuda yê rojnameyê bi îdiaya "Rêzpropagandaya rêxistinê kiriye" doz lê hatibû vekirin û 5 sal ceza dabûn. Cezayê Çoban li dadgeha îstîfafê hatibû xerakirin. Piştî doz hat xerakirin yekemîn danîşîna dozê li 7'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hat dîtin. Çobanê ku niha ji ber dosyayêke din li Girtîgeha Tîpa T a 3'yemîn a Tarsusê girtî ye, bi rêya SEGBİS'ê beşdarî danîşînê bû. Parêzerê Îsmail Çoban Resûl

Tamûr jî li salona danîşînê amade bû.

Bêhûrmetiya li dijî kurdî

Dema parêzer Resûl Tamûr, ji bo muwekilêx we daxwaza tercûman kir, Çoban jî li hemberî pirsên tirkî bi kurdî bersiv da. Vê carê jî serokê dadgehê got "Hat dîtin ku bersiv pirsên tirkî yê serokê dadgehê, bi zimanekî nayê famkirin bersivandiyê" û derbasî girtekan kir.


Çoban bi kurdî xwe parast û got: "Ez sucdariya der barê xwe de qebûl nakim." Çoban xwest wî bibin salona danîşînê lê heyeta dadgehê ev daxwaza Çoban red kir.

Piştî parêzer Resûl Tamûr xwe parast û anî ziman ku muwekilê wî xebatkarê rojnameya kurdî ye û li gorî xala TMK 7/2 nûçeyên hatine çêkirin ne sûc in. Tamûr xwest muwekilê wî beraet bike. Heyeta dadgehê xwest peryê tercûman ji Çoban bê standin

û danîşîna dozê taloqî 16'ê sibata 2021'ê kir.

Dadgehê di danîşîna doza siyasetmedarên kurd ên ji doza sereke ya

KCK'ê dihatin darizandin de jî kurdî wekî "zimanê nayê zanîn" derbasî girtekan kiribû û ev bûbû sedema bertekên tund. **AMED**



Bi dehan kes hatin binçavkirin

Navenda Nûçeyan

Li bajarên Kurdistan û Tirkiyeyê operasyonên binçavkirinê didomin. Heftaya borî polîsan bi ser gelek malan de girtin û bi dehan kes binçavkirin.

Li dijî welatî, kesayet, siyasetmedar; sazî û rêxistinên sivil ên civakî bînavber operasyonên pêla binçavkirin û girtinê pêk tên. Li ser fermana doz-

geriya li hin bajaran polîsan bi ser malan de girtin û gelek kes binçavkirin. Her wiha polîsan di serdegirtina malan de kelûpelên welatiyan jî serûbin kirin.

Li navçeya Hezex a Şîrnexê polîsan bi ser mala rêveberê HDP'ê yê berê Husnu Babat de girtin û ew binçavkirin. Babat ê sedemê binçavkirina wî nehat zanîn birin Midûriyeta Polîsan a Hezexê.

Li Wanê polîsan di serdegirtina de Deniz Adar Eldemîr, Dilaver Eldemîr, Ferhat Azan û Arjîn Tuncer binçavkirin. Di çarçoveya heman lêpîrsînê de Ferhat Eldemîr jî li Xarpêtê hat binçavkirin.

Li Amedê di serdegirtinê malan de endamê rêveberiya Odeya Avahîsazan a Şaxa Amedê Azîz Yagmûr û kesê bi navê Mehmet Yalçın hatin binçavkirin. Polîsan di serdegirtina mala Yagmur de pê li pişt Çeko Mîmkara, Azîz Yagmur, Mehmet Yagmur û Fûrkan Yagmar kirin û heqaret li malbatê kirin. Polîsan bi qûndaxa sîlehê li Umît Akbiyîk dan. Akbiyîk û Mîmkara ji bo rapora lêdanê werbigirin çûn nexweşxaneyê.

Li Sêrtê jî polîsan bi ser mala endama Meclisa Giştî ya Bajêr Cemîle Altan de girtin û li malê lêgerînê pêk anîn. Piştî lêgerînê Cemîle Altan binçav kirin û birin Midûriyeta Polîsan a Sêrtê.

Hat zanîn ku li Êlihê jî polîsan bi ser gelek malan de girt. Tê gotin der barê 15 kesan de biryara bin-

çavkirinê heye û 14 kes bi îdiaya bûyerên 6-7-8'ê cotmehê yê Kobanê hatine binçavkirin.

Li Îzmîrê jî polîsan bi ser gelek malan de girt. Di serdegirtinê malan de kelûpel hatin belavkirin û dest danîn ser materyalên dijîtal, telefon û kompîteran. Di serdegirtina de Zerga Ozturk, Fadîme Kocakaya, Zûhal Çelebî, Hediye Tekîn û Mutaber Akgul bi îdiaya "endamî û propagandaya rêxistinê" hatin binçavkirin. Her wiha hat zanîn ku biryara qedexeya hevdîtinê ya 24 saetan danîne ser kesên binçavkirî.

Li Enqereyê jî derdozgeriya komarê der barê gelek kesan de biryara binçavkirinê daye. Polîsan di çarçoveya lêpîrsînê de bi ser gelek malan de girtin. Di serdegirtina malan de endama meclisa HDP'ê ya berê Erol Çiftçi, endamê Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) Tûnahan Gozlugol, endamê Meclisa Ciwanan a HDP'ê Newroz Gulen, Mesût Çiftçi, Ezgî Orak û Mahmûd Altan ê 73 salî yê nexweş hatin binçavkirin. Hat gotin ku bi hinceta "propagandaya rêxistinê kirine" hatine binçavkirin.

Heftaya borî parêzer jî di nav de bi dehan kes hatibûn binçavkirin û di encamê de gelek kes hatibûn girtin.



Rojnameger Dîndar Karataş hat girtin

Girtin û binçavkirina rojnamegeran didome. Nûçegihanê Ajansa Mezopotamya (MA) Dîndar Karataş bi hinceta hevdîtinê wî yê li gel çavkaniyên nûçeyan û hin nûçeyên çêkirine bi îdiaya "Endamê rêxistinê ye" duh ji aliyê Dadgeha Erziromê ve hat girtin. Karataş şandin Girtîgeha Erziromê ya Tîpa H û ew xistine hucreyê. Hat zanîn ku Dê Karataş bi hinceta vîrûsa koronayê (Kovîd-19) du hefteyan di hucreyê de were ragirtin. Her wiha polîsan li Enqereyê bi îdiaya endamê rêxistinê ye nûçegihanê MA'yê Hakan Yalçın jî binçav kir. **ERZİROM**

Mêran di 10 mehan de 246 jin kuştin

Wezaretê Karên Navxweyî di 18'ê cotmeha 2019'an de cara duyem qeyûm danî ser Şaredariya Colemêrgê ya HDP'î. Endamên Meclisa Şaredariyê ya HDP'yî têkildarî nelirêtî û bêusûliyên li şaredariyê hatin kirin û tên kirin daxuyanî dan û yek bi yek ji raya giştî re aşkera kirin. Encûmenan li ber avahiya HDP'ê daxuyanî dan. Li ser navê encûmanan Emîn Ertûş axivî û di daxuyanîyê xwe de diyar kir ku di serdema qeyûmê ewil de 207 milyon TL deyn derketiye û piştî ew di sala 2019'an de hatine ser kar 17 milyon TL deyn dane. Ertûş destnîşan kir ku di serdema qeyûmê niha de jî heta niha 50 milyon TL nelirêtî hatiye kirin. **COLEMÊRG**

Qeyûm 50 mîlyon TL nelirêtî kir

Parlamentêrê CHP'ê yê Stenbolê û wekilê serokê Komîsyona Mafên Mirovan a Meclisê Sezgîn Tanrikûlû, "Rapora 25'ê Mijdarê Roja Tekoşîna Navneteweyî ya li Dijî Tundiya li Jinê" aşkera kir. Tanrikûlû, anî ziman ku di 10 mehên sala 2020'an de 246 jin ji aliyê mêran ve hatine kuştin. 151 jin bi guman mirine-hatine kuştin û bi giştî 397 jinan jiyan xwe ji dest dane. Tanrikûlû, destnîşan kir ku Peymana Stenbolê û hejmarê 6284'an a zagonê nayê sepanandin. Tanrikûlû, di raporê de anî ziman ku di 8 salên dawî de herî kêm 907 jin di cînayetên kar de mirine. **ENQERE**

MIN XWEST BIBIM PIREK DI NAVBERA ZARAVAYÊN KURDÎ DE Şêrko êdî di kurmancî de ne Bêkes e

■ Rizoyê Xerzî

Nivîskar û wergêr Muhsîn Ozdemîr bi wergerên xwe yê helbestên ji zimanê farisî yê Furûx Ferroxzadê û Sohrab Sepehrî, her wiha romana Sadiq Hidayet a bi navê Bûmê Kor hat nasîn. Her wiha we navê wî ji veguhestina helbestên Şêrko Bêkes ji zaravayê soranî bo kurmancî jî bihiştîye. Ji bo em Muhsîn Ozdemîr bêtir nas bikin, me ji bo we xwînerên Xwebûnê ev sohbet pê re kir.

Navê Muhsîn Ozdemîr ji nivîskariyê bêtir bi wergerê derdikeve pêş. Çi bû sedem tu dest bi karê wergerê bikî, her wiha bi te girîngiya wergera ji zimanekî din bo kurdî çi ye?

Di serî de spasiya xwe arasteyî rojnemaya Xwebûnê dikim, ev eleqemendî nîşanî min dan ku vê hevpeyvînê bikim.

Helbet berî ku dest bi wergerê bikim, di serê min de planin hebûn ku hin serhatiyên xwe bi kurdî binivîsim. Min dixwest hin kêliyên dîrokî yê di jiyana min de, wek belge bimînin. Ji ber ku ew serhatî ne yê min tenê bûn, bi xwe re hezaran kes têkildar dikirin lê rewşa min a tenduristî, fikara mirineke nişkegavî her li ber çavê min bû. Ji ber wê, bi qasî mehekê li zindana Licê ya Amedê min romana serhatiya xwe ya bi navê "Sê Tilîlî" nivîsand, li ser hesabê ku piştî mirina min were weşandin.

Xweşbextane, piştî derketina ji zindana hino hino min ev fikar derafî kirin û ketim nav lêgerînan.

Di serî de min dixwest hin gotar binivîsim têkildarî vebîra/hafizeya kurdî. Di hin rojnemayên kovarên xweçihî yê Êlihê de min gelek gotarên têkildarî çand-vebîra kurd, carna bi tirkî, bi piranî jî bi kurdî nivîsandin. Di vê navê de jî min gelek pirtûk xwendin û gelek jî nivîskar şopandin. Derfet çêbûn bi rêya înternetê gelek nivîskar û şairên îranî jî bixwînim. Her wiha gelek berhemên bi zaravayê kurdî-soranî jî. Berê, bi salan li îranê, di zindanan de mabûm, bi fermî jî min farisî xwendibû, soranî jî min dizanî. Min di zindana îranê de gelek berhemên farisî xwendibûn, gelek berhemên ku hatibûn wergerandin ser zimanê farisî jî li wir min xwendibûn. Wexta ku li Tirkiyeyê min hin berhemên ji farisî hatine wergerandin xwendin, bi yê farisî re berawird kir, min dît ku zêde tahmsar dibe. Her wiha min didît ku gelek qalibên zimanê kurdî di nav risteyên farisî de jî veşartî ne. Di wê baweriyê de bûm ku kurdî pir şîrîntir e, tahma wê cuda ye. Min dil kir, dest bi wergerê bikim.

Te çi hewcedarî pê dît ku ji zaravayê soranî (vegûhêzî) kurmancî?

Bi qasî ku min xwendî û pê dizanim, piraniya şair û nivîskarên me yê navdar jî ev kar kiribûn. Ji Mîr Celadet bigire heta Hejar Mukriyanî. Bi taybetî jî Hejar Mukriyanî bala min dikîşand. Min ji xwe re digot, çima pêwîst dît Mem û Zîn a Ehmedê Xanî wergerîne ser zaravayê Soranî (bi gotina wî Mukriyanî). Nexwe wî jî didît, her ku wext derbaz dibe, di nav şertên ku Kurdistan dabeş bûye de, hino

hino dîfalektên kurdî jî yan wê tîk biçin, yan jî wek zimanekî serbixwe li wan bê. Bi xeyala ku bibim pirek di navbera zaravayên kurdî de, min wergerandina-kurmancîkirina zaravayê kurdî-soranî jî ji xwe kir armanc. Helbet ne tenê ev, gelek berhemên giranbuha yê kurdî, bi zaravayê soranî hatibûn lêkirin, li bakur jî tenê hin rewşenbîr ji vê haydar bûn, tew li bakur meyla xwendinê ber bi berhemên rûsî û rojavayî bûn, yan jî yê tirkî. Ji ber vê min xwest ji hin helbestkarên mezin ên bi zaravayê soranî dinivîsin dest pê bikim. Car hebû, min helbesteke wan werdigêrand, yan jiyana-nameya şairekî di kovar an rojnemayan de belav dikir; car hebû me berhemên wan jî wek pirtûk amade kirin. Îro bi sed hezaran kurmancîxêv Şêrko nas dikin, dixwînin an dizanin. Di vir de helbet bandora me jî ne hindik e. Çendîn mînakê din jî dikarim bidim.... Îro ro sedan xwendevanên kurd ên bakur dixwazin, xwe hîni soranî bikin, bi akademîkî tev bigerin. Her wiha ên soranîxêvên başûrê Kurdistanê jî wisa. Tezên bi dehan kesên li Bakur dixwînin, min raçavkirine ku li ser şairên Başûr, bi kurmancî amade kirine.

Ji nav helbesta Îranê çima wergera helbestên Sohrab Sepehrî?

Helbet gelek sedemên xwe hene lê ya herî zêde hişt ku Sohrab hilbijêrim. Têkiliya wî ya bi xwezayê re bû, bêyî ku têkildarî siyasê bibe, yan tevî bibe, kariye keleheke ewqasî mezin lê bike ku tebarek be. Dîmeneke pir hêsan û sade jî karî watedar bike û xweşkahiyekê bide jiyane. Bi xwezayê re xweşbêj bû û pê re dijiya. Ji yana min jî hema hema çend salên dibistana navendî û amedeî nebin, tim di nav dehl û diriyana de bû. Hê jî li bajaran xerîb im di bajaran de. Bi sohrab re min xwe di her quncikê xwezayê de û xwezayî didît.

Di wêjeya Îranê de bi rastî jî helbestvanê wek Furûx û Sohrab mohra xwe li helbesta Îranê dane. Piştî te werger qedand herî zêde kîjan aliyê Sohrab Sepehrî an jî kîjan helbesta wî bala te kişand, çima?

Helbet bi kurmancî, cara yekem wek pirtûk min berhemên Sohrab û Furûx wergerandin. Di serî de ji her duyan min, berhemek wan hilbijart ji bo weşandinê. Ya Sohrab "Dengvedana lingê avê" (Dengê lingê avê), ya Furûx jî berhema wê ya nîvrê mayî "Em baweriyê bi destpêka demsala sar bînin" bi mamoste Cewad Pale re me wergerand. Piştê bi vê tîr nebûm, min dubare hemû berhemên Furûx û Sohrab wergerandin. Ya Furûx, çend sal berê çap bû, ya Sohrab jî îsal bû nesib. Helbet herî zêde çemhelbesta wî ya "Dengê lingê avê" gelek bandor li min kiriye. Wexta di zindana Îranê de bûm, hevlekî min bi devkî ji wê çemhelbestê çend riste ji min re gotibûn, min ji ber kiribû, digot ev helbest di welatê şair bi xwe de qedexe ye. Wisa di serê de min de mabû. Jixwe min bi wê çemhelbestê dest bi wergerê kir. Çend ji wan risteyên ku ji ber dizanim;

Ez nizanim

*Ku çima dibêjin hesp heywanek esîl e
Kevok xweşik e*



Bi xwezayê re xweşbêj bû û pê re dijiya, jiyana min jî hema hema çend salên dibistana navendî û amedeî nebin, tim di nav dehl û diriyana de bû. Hê jî li bajaran xerîb im di bajaran de. Bi helbestên Sohrab Sepehrî re min xwe di her quncikê xwezayê de û xwezayî didît

*Çima di qefesa kesî de sîsyarek tune ye
Gulnefelê çi ya xwe kême ji alaleya sor
Çav divê werin şuştin şeweyek din bê dîtin
Bêje divê bêne şuştin
Bêje divê ba bixwe bêje divê baran bixwe be*

Werger karekî zehmet e, bi taybetî jî dema ku helbest be, te gelek helbestên farisî wergerandine kurdî. Zehmetî û pirsgirêkên derdiketin pêşiya te çi bûn?

Vê jî em bêjin, min ne tenê helbest wergerandine, her weha min hin berhemên Sadiq Hidayet jî di nav de gelek berhemên din ên nehatine weşandin jî û gelek gotarên akademîk jî wergerandine.

Di wergerandina peşxanan de kême zêde rêyek heye mirov kevanekê veke, yan tîbîniyekê deyne ku mijarê rabigihîne. Di wergera helbestê te, car heye, mirov dielîqe, hin riste û newa û deng hene ku tenê di zimanê wî miletî de tahma wê heye û watedar e, wexta tî wergerandin jî weke ku mirov gunehê kiribe. Diviyabû em vî gunehî bikin; dizanim helbestwergerandin zehmet e, hin dibêjin xiyane e lê min kir. Bila be. Min kurmancîze kir. Dibe ku îtiraz jî hebin, mafê wan e lê heta ku vî mafî berovajî biparêzin dê şairên xwe yê bi zaravayên din ên kurdî û şairên din ên dinyayê jî di welatê me de biyanî bihêlin. Ji ber wê min gotibû, Şêrko êdî di kurmancî de ne "bêkes" e. Şairên din ên îranî jî êdî bi kurmancî ne.

Tu di wergerê xwe de çi rêbazê bi kar tîni?

Wisa bêjim ku rêbazê min a standart heye û li gor wan pîvanan tev digêrim, ne rast e. Helbet kême û zêde min hay ji hin teknîk û rêbazan heye. Wergerên ku dikim tenê ne helbest û peşxanên wêjeyî ne; carna yê zanistî ne, carna yê bijîşkî ne, carna jî yê reklam û daxuyaniyan in. Li gorî mijarê hin pîvan û rêbaz tî gihertin ku hetanî çî radeyê

dikarim xwedî înişiyatîf bim. Ji ber vê mebestê, min berhema zimannas û dîroknasê navbang ê kurd Cemal Nebez a bi navê "Wergerandin Huner e" wergerand ser zaravayê kurmancî ku di sala 1954'an de amade kiribû.

Ji bilî rêbazên wergerê, li ser gotinên qalibî pir hişyar im. Ji ber ku gotinên qalibî, hem di piraniya zaravayên kurdî de û farisî de jî zêde li pêş in. Car heye li hember qalibên wan, kurmanciya wan nabînim, mecbûr dimînim, şîrove deynim. Helbet ev mijarek berferê e. Bi qasî pirtûkekê jî hêjayî nixandîne ye. Heta ku ji me bê, wergerê, ne wek pişe, wek huner bi kar bînin.

Wekî min bihişt ji bilî farisî û soranî haya te ji zaravayê goranî jî heye. Gelo di wê derbarê de tî plan û projeyê te heye?


Zaravayê Goranî ku kevintirîn zaravayê kurdî dixuyê, yê herî nêzî zimanê avestayî ev zarava ye. Di wergerandina dîroka Hewramanê de, bi ser gelek agahiyan ve bûm ku sedan salan ev zarava di piraniya Kurdistanê de wek zimanê fermî bûye, lê mixabin, îro belkî ji çend gundan zêdetir pê nayê axaftin; Hewramî yan dirêjahiya wê ye, yan jî beşek jê. Dîsa di wergerandina hin berheman de rastî gelek tîgînan dihatim. Min didît piraniya van tîgînan vedigerin ser zaravayê Goranî. Van heyamên dawiyê, ji min re hat raspaspartin ku beşek ji pirtûka pîroz Serencamê bi latîni binivîsim. Min gelekî serê xwe pê re êşand. Gihiştim wê astê ku sedî not ji wate û dengê Goranî fêhm bikim. Helbet wek xebateke hevbeş-desteyî, bi alîkariya hevalên goranîxêv, ev berhem wê bi raçavkirina min, ji çapê re amade bibe.

Wek proje, vêga tam nebêjim, lê berhem û çavkaniyên têkildar bi çanda me ya kevnan a li ser Hewramanê hatine amadekirin. Tenê maye li ser peymanê ku dest bi wergera wan ji bo kurmancî bikim.



Muhsîn Ozdemîr kî ye?

Di sala 1970'yî de li gundê Zivinga Şikakan a girêdayî Fındika Botanê hatiye dinyayê. Dibistana seretayî li Zivinga Şikakan xwendiyê. Dibistana navîn û amadehiyê li bajarê Wanê qedandiyê. Ji ber sedemên siyasî bi salan li derveyî welêt maye. Di sala 2003'yan de li Êrmiyê hatiye girtin. Di dibistana zindana de fêrî zimanê farisî bûye. Gelek berhem ji zimanê farisî û zaravayê soranî wergerandine kurmancî.



KitêbXaneya CAB

Yaqob Tilermenî

Jozef Czapski: Wênesaz û Nivîskar

Dema mirov endamê civakeke bindest be û li gorî pergala serdestên xwe di çerxa perwerdeyê re derbas bûbe, bivê nevwê ji hişmendiyê bigire heta tevgerên xwe yê jiyani li gorî wê pergale teşe digire. Ger mamoste be weke mamosteyekê/î wê pergale, ger karsaz be weke karsazekê/î hewcedarê zagonan, ger avahîsaz be weke avahîsazekê/î bi regezên diyarkirî re guncandî û ger hunermendek be weke hunermendekê/î bi agahiyên ji zimanê fermî gihîştî afirîneriya xwe û hilberîna xwe dike. Bi tenê kesên ku bi hewl daneke dijîrêzî derketibin derveyî rê û rêçikên jiyana serdestan û di ser zimanên dîtir re xwe bi pêş xistibin, ne ji sedî sed be jî bi rêjeyeke erênî dê karibin weke şeydayên ji komeke dîtir di nav hilberînekê de cih bigirin.

Dibe ku li hemberî tesbîteke wiha gelek dengên dijber bilind bibin, lê rastîya jiyane û jiyînên mirovên ne ji koma serdestan dikarin weke mînakên şênber xwe bidin selmandin.

Bi qasî 25 salan e di nav seqaya kurdînûsiyê de cih digirim û bi esehî hewl didim ku xwe ji pest û bandora civaka serdest biparêzim, lê zimanê serdest ê hem min perwerdeya xwe pê kiriye û yê min hewl daye di ser re xwe bigihînim qad û quncikên hunera cîhanî, her tim ez di nav qefeseke tengik de zevt kirime û her astengî ji min re çêkiriye ku xwe bi her awayî bigihînim agahiyên rasteqînî yê cîhaneke dîtir. Ji lew re min karibûye di ser zimanê serdestî re xwe bigihînim wêjeya cîhanê û bi tenê berhemên ku li vî zimanî hatine wergerandin bûye para xwendina min û para xwepêxistina min. Li vir mînaka "min"ê weke kirde ne ez bi tenê me, yek ji nimûneyan e ku zehfên hevalbendên me dikarin ji bo xwe jî guncav bibînin. Çimkî, piştî salan ku ez ji nav seqaya serdestiyê hinekî bi dûr ketim, çêtir têgihîştim ku di qada wêjeyê de jî û di qada hunera cîhanî de jî çiqasî ji dewlemendiyeke bêhempa bêpar mame. Min fam kir ku xerabiyên pergale totalîter dîsa bi pênuş û firçeyên hunermendan dikarin werin aşkerakirin.

Ger tesbîta xwe bi mînakekê berbiçav bikim, qest û mebesta min ji "bê-parmayîne" hinekî din dê baştir were famkirin. Welatê ku ez lê dijîm, li her quncik û kenarên wê cîhên weke çandxanê û muzexane zehf in. Jixwe hejmarên galerî û kargehên hunermendan bêhejmar in. Ger mirov bixwaze, dikare her rojê xwe bigihîne cihekî cuda û bi agahiyên nebihîstî bîra xwe ya rewşenbîrî dagire.

Bi vê mebestê ez li gel malbata xwe bi çûna saetêke rê li cihekî wiha pirçandî bûm mêvan û min bi gera xwe ya li nav galeriyeke taybet ji bo temaşekirina wêneyên hunermendekî gewre cehd da. Hem hêwanên pêşangehan, hem pirtûkxaneyê pênçqatî ya bi mîmariyeke resen avakirî, hem odayên xebatê yê nivîskaran û hem jî kafeya xwarin û vexwarinê li nav gundekî ancax di xeyalên mirovên hunerhez de dikarin cih bigirin.

Di serencama ceħda xwe de jî pê hesiyam ku mirovek heye ku bi qasî sedsalekê mohra xwe li jiyana û cîhana hunerî daye. Jixwe ev naskirin jî bi saya zanîna hinekî bi zimanê fransî û li wêlatekî weke Swîsreyê bû para min. Li gundekî biçûk, di pala çiyê de cihekî berfireh ê li ser çend donim erd ku tenya ji bo karên hunerî terxankirî û ji bo xwegihandinê hêsana, derfeta dîtir

û şahidiya mirovekî nû da min: Jozef Czapski.

Mirovê bi navê Jozef Czapski (1896-1993) ku li Pragê li qesra apê xwe yê bi navê Franz von Thun und Hohenstein hatiye dinê, zarokiya xwe li Mînska nêzîkî sînorên rojhilata Polonyayê jiyaye (Rûsyaya Spî ya îro) û ji ber awustiryayîbûna dêya xwe, almanîbûna bavê xwe û polonîbûna pîrika xwe li nav malbateke arîstokrat mezin bûye. Ew weke ciwanekî bûye şahidê torinîbûna ewropî ya li nav siyasatmedar û dîplomatan jî. Serdema ew tê de jiyayî, bi şer û peymanên aştiyê, guherînên sînoran û dîrokeke nû re li hev zêde bûye. Ji ber ku ew di 96 saliya xwe de li Fransayê çûye ber dilovaniya Xwedê, di heman katê de weke aktorê û çavdêrekî sedsala 20'ê min de jî jiyaye. Wî Rûsyaya Împeratoriya kevin jî dîtîye, şahidiya şoreşa 1917'an jî kiriye û di nav leşkerên polonî de gihîştîye mertebeya serbaziyeke bilind jî û bi veqetîna ji leşkeriyê bi xweseriya xwe ya resen hesiyaye û li gel hin hevalên xwe komeke pasîfîst a hunerî damezirandine.

Ji ber avabûna welatê Polonyayê derbasî wir bûye û ji naçarî di karekî leşkerî de peywir girtiye. Peywira wî, peyda kirina serbazan bû ku ji ber tawanbariya sixurtiyê ji teref Bolşevîkan dihatin girtin û kuştin. Bi derbasbûna xwe ya nav Rûsyayê derfeta naskirina nivîskarên navdar ên weke Merejkovski, Hippus, Filosovof, Crapski, Inco û gelek kesên din bi dest xistiye. Sala 1923'yan di binê hîmayeya mamostayê xwe Jozef Pankiewicz de bi hevalên xwe re Komîteya Parisê ava kirine ku xwendekar karibin li Fransayê bi fonekê perwerdeya xwe bikin û weke rêberê komeke 12 kesên wênesaz gihîştine Parisê.

Jiyana wî ya têkelî wênesaziyê bi vî awayî dest pê kiriye û li gelek navendên Ewropayê yê weke Cenevre, Paris, Varşova, Cracowê pêşangehên xwe vekirine. Pê re jî di kovarên hunerî û wêneyî de dest bi nivîsina gotaran kiriye. Bi Şerê Cîhanê yê Duyemîn re ku Polonya ji teref Sovyetê ve hatiye bidestxistin, Czapski û bi hezaran hevalên xwe di kampekê de weke dîl hatine mehkûmkirin. Wî ji bo ku di kampê de êşên hevalên xwe bitemîsîne, dersên fransî daye wan û di ser berhema Li Ser Şopên Demên Wendayî ya Marcel Proust re konferansên wêneyî pêşkêş kirine û ev konferansên wî li ser kaxizan bi pênuşa rijî di sala 1941'ê de (Proust contre la déchéance) hatine nivîsandin.

Bi peymana Alman-Sovyetan bi serbestberdana girtiyan a biryara Stalîn re ji bo azadkirina Polonyayê li gel sergordên rûsî dest bi xebatan kiriye. Piştî ku bihîştîye Stalîn biryara kuştina 20 hezar hêşîran daye, xwe ji nav wan leşkeran rizgar kiriye û bi vî awayî li jiyane maye. Van bîranînên xwe di pirtûka xwe ya bi navê Souvenirs de Starobielsk et Terre Inhumaine (Bîranînên Starobeilskê û cîhana dermîrovî) de nivîsandine (1944). Digel ku Yekitiya Sovyetê ev qirkirin red kiriye jî Czapski her tim bîranîna wan serbazan zindî hiştiye û tim tûşî tawanên Sovyetê hatiye.

Jozef Czapski ji Meşeda Îranê, di ser Iraq, Felestîn û Misirê re ji bo şer çûye Îtalyayê. Li wir bûye serokê Saziya Enformasyon û Propagandayê ya Cîhana Duyemîn. Pirtûkên nivîskarên mixalîf weşandine û çalakîyên hunerî li dar xistine. Li ser fermana Stalînî li Po-

lonyayê îlankirina pergala Komunîzmê, Czapski weke mirovekî xayin hatiye binavkirin. Li Romayê di bin banê Enstîtuya Wêje û Kulturê de kovareke bi navê Kultura bi hevalên xwe yê navqedexê weke Milozs, Gombrowicz, Boris Pasternak, Aldous Huxley, Soljenitsyne derxistine. Kovar ji ber dijberiya Stalînî tim gef û gurr xwarine û bi saya nivîskarên weke Andre Malraux, Daniel Halevy û Albert Camus li ber xwe daye. Kovarê di sala 1947'an de navenda xwe birîye Fransayê û heta dawiya sedsala 20'ê min jî weşana xwe berdewam kiriye. Czapski di ber re jî nîgarkêşiya xwe ya wênesaziyê berdewam kiriye û di gelek pêşangehan de cih girtiye. Digel ku bala wî bêtir li ser wêneyî bûye, wî dest ji nivîsînê jî bernedaye û bûye weke kesekî herî mezin ê nivîskariya Polonyayê. Di maleke yekodeyî ku weke kargeha hunerî bi kar

aniye, bi jiyaneke mutewazî konferans dane, qurs û semîner pêşkêş kirine û li dijî totalîterîzma Sovyetî xebat meşandine. Di Kongreya Çanda Azad de weke aktîvîstekî cih girtiye û raya xwe ji bo girtiye siyasî û qurbanên binê zilmê bi kar aniye.

Berhemên Jozef Czapski bi taybetî li galeriyên Paris, Londra û Swîsreyê têne pêşandan. Swîsre ji bo wî cihekî taybet e: Li vir bi feylesof Jeanne Hersch û hunermend Thierry Vernet û Florsitella Stephani re hevaltiyên xurt kiriye. Weşanxaneyê L'Âge d'Homme ya ku wergerên pêşîn ên ji fransî weşandine, li Swîsreyê ye. Dîsa weqfa Jan Michalski ya li Swîsreyê xebata weşandina teksta li ser kaxizê ya bi pênuşarijî nivîsandî (Proust contre la déchéance) dimeşîne ku wê ji rizandinê biparêze. Di sala 1985'an de Czapski ji bo Nouvelle Biennale de Parisê hatiye

vexwendin; li wir weke mirovê herî temendirêj ê xwedî rûmetê hatiye peji-randin. Ew di 12'ê çileyê 1993'yan li Maisons-Laffitte ya Fransayê çûye ber dilovaniya Xwedê.

Helbet Jozef Czapski û gelek hunermendên cîhanî hem bi afirîneriya xwe û hem jî bi aktîvîstiya xwe rengdaneke bêhempa dane jiyana hunerî û pê re jî bûne weke wijdanê mirovatiyê ku xerabiyên pergale totalîter aşkera kirine. Jixwe ji bo naskirina jiyana wan bi giştî pêdivî bi hezaran rûpel dokumentan heye. Belkî bi çend gotinên hêsankirî min xwest ez wî bi xwînerên kurd bidim naskirin û helbet ji bo ku ez mirovekî wiha xwedî jiyaneke sedsale nas bikim, diviyabû min xwe ji zimanekî serdest bi dûr bixista û zemanekî nêzîkî nivîsedsalekê li dû xwe bihişt. Bi hêviya ku rojekê berhemên wî ji bo zimanê kurdî jî werin wergerandin.



FONDATION
JAN MICHALSKI
POUR
L'ÉCRITURE
ET LA
LITTÉRATURE
1147 MONTRICHER

JÓZEF
CZAPSKI
PEINTRE ET
ÉCRIVAIN

3 OCTOBRE 2020
- 17 JANVIER 2021

Têkiliya ENKS'ê ya bi Tirkiyeyê re asteng e

Navenda Nûçeyan

Hevdîtînen di navbera Encûmena Niştîmanî ya Kurdên Sûriyeyê (ENKS) û Partiyên Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdî (PYNK) de herî dawî ji ber nelihavkirina li ser xalên mîna perwerdeya kurdî û hevserokatiyê xitimîbûn. Bi destpêkirina hilbijartinên Amerîkayê şandeya amerîkî ya navbeynkara diyalogên di navbera her du aliyan de bû, vegeriya Amerîkayê. Her wiha hat gotin ku ji ber vê yekê jî diyaloga kurdî-kurdî ji bo demekê sekniye.

Wek tê zanîn beriya sê hefteyan ENKS'ê berê xwe da Tirkiyeyê û bi Wezareta Karên Derve ya Tirkiyeyê re hevdîtîna pêk anî. Der barê vê hevdîtînê de ENKS'ê û tîkiliyên wê yê bi Tirkiyeyê re em bi berdevka PYD'ê, endama PYNK'ê û endama Diyaloga Kurdî Sema Begdaşê re axivîn. Begdaş diyar kir ku tîkiliyên ENKS'ê tu carî bi tirkan û bi îtîlafan re bi dawî nebûne.

Endama PYNK'ê Sema Begdaş di axaftina xwe de bal kişand ser diyaloga kurdî-kurdî û da zanîn ku bi çûyîna şandeya Amerîkayê re diyalog sekniye û der barê rewşa dawî de wiha got: "Piştî hilbijartinên Amerîkayê dê şandeyeke nû were û diyalog ji cihê mayî bidome. Diyalogê li gorî esasên peyman Duhokê dest pê kiribû. Di diyalogê de tiştê baş ew bû ku di danîşîna duyemîn de Lêvegera Kurdî ya Bilind dê çî kar û xebatan ji bo gelê kurd û Sûriyeyê bike û der barê erk û xebatên hatine nîqaşkirin de (heft xalên sereke) me Lêvegera Kurdî bi dawî kiribû. Her wiha me dest bi nîqaşkirina rêveberiya xweser kiribû û bi giştî em dikarin bibêjin ku gelek gavên baş jî hatibûn avêtin. Xala dawî ew e ku şewazên tevlibûna ENKS'ê ya ku tevî rêveberiya xweser bibin û hilbijartinê bidin destpêkirin. Piştî tevlibûna ENKS'ê û pesendkirina her du aliyan dê hilbijartinên fermî pêk bihatana."

Astengiyên li ber diyalogê

Sema Begdaş bal kişand ser sekna ENKS'ê ya di diyaloga kurdî-kurdî de û

Endama PYNK'ê û Diyaloga Kurdî-Kurdî Sema Begdaş der barê çûna ENKS'ê ya Tirkiyeyê de axivî. Begdaş destnîşan kir ku tîkiliyên ENKS'ê hem bi Tirkiye û hem jî bi îtîlafê re hene û anî ziman ku ENKS'ê xwe ji wan hêzan rizgar nekiriye

destnîşan kir ku piştî şandeya Amerîkayê çû, ENKS'ê xwestiye hin astengiyên derxîne û ev tişt anî ziman: "Lê tiştên ku dawiyê derketin holê ENKS'ê hem bi Rûsyayê re hem jî bi Tirkiyeyê re hevdîtîna kirin. Piştî hevdîtînan xwestin astengiyên li ber diyalogê derînin.

Mînak di hevpeymanî civakî de li ser tiştên ku me her du aliyan jî li hev kiribû de xwestin hin xalan beriya hilbijartinên Amerîkayê biguherînin. Yanî xwestin vê meselê dûdîrêj bikin da ku diyalog zûbizû encamê nede. Em di nav wê hewldanê de bûn ku beriya hilbijartinên Amerîkayê em bigihîjin encamê erênî û jî gelê xwe re ragihînin.

Piştî ku ji Tirkiyeyê vegeriyan bi planên cur bi cur li ber me sekinîn. Mijarên ku me berê li ser wan li hev kiribûn ENKS'ê carek din xiste rojevê û dîsa pirsgerêk derdixistin. Em wek şandeya PYNK'ê tim jî nîqaş û diyalogê re vekiribûn di gelek xalan de em nerm bûn. Ji ber ku mesela yekitiyê meseleyeke girîng e me dixwest zû bi encam bibê. Li gor xalên mayî (wek meseleyên leşkerî) em ê hê nîqaş bikin. Li gor rêkeftina Duhokê em ê meselaya leşkerî nîqaş bikin. Ger pêşmerge werin dê werin nav Hêzên Sûriyeyê Demokratîk (HSD), du hêz li ser vê axê nabin. Di demên pêş de jî em ê li ser van mijaran nîqaş bikin."

Hevdîtînen bi Tirkiyeyê re

Di axaftina xwe de Begdaş qala tîkiliyên ENKS-Tirkiyeyê kir û anî ziman ku çûna ENKS'ê ya Tirkiyeyê ji bo nûkirina tîkiliyên wan e û wiha domand: "Em tevî dizanin ku ENKS niha di hundirê îtîlafê (îtîlafa li herêmên Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî yê dagirkirî) de ye. Dema em li sekna wan dinêrin heta niha ENKS'ê tu bertek nîşanî bûyerên li Serêkaniyê û deverên din qewimîne nedaye. Heta niha bi wan kesên axa me dagirkirine re kar û xebatên xwe didomînin. Tîkiliyên

ENKS'ê tu carî ne bi tirkan re ne bi îtîlafê re qut bûne. Îro di serî de Neteweyên Yekbûyî gelek dewletan bertek li hember bûyerên li Serêkaniyê û Efrînê pêk tên nîşan didin lê jî ENKS'ê me tu bertek nedîtiye. Ev yek nîşan dide ku bi talîmat û perspektîfên wan kar dikin. (ENKS di nav îtîlafê de ye, îtîlaf jî rasterast girêdayî dewleta tirk e) Di herêmên îtîlafê dagirkirine de zimanê perwerdeyê tirkî ye; pereyên Tirkiyeyê tîkî bikaranîn û zîmanê kurdî qedexe ye. Bi hezaran kurd tîkî kuştin. Ji ber vê yekê jî ENKS her çîşas îro bêje ez temsîla gelê Sûriyeyê dikim, ev yek ne rast e. Ev opozîsyona heyî temsîla gelê Sûriyeyê nake! ENKS xizmeta dewleta tirk dike ku dixwaze projeya Osmanîyan pêk bîne. Ew bi vê armancê çûye Tirkiyeyê."

'Xwe ji Tirkiyeyê rizgar nekiriye'

Endama PYNK'ê Begdaş destnîşan kir ku ENKS'ê di serî de di nav îtîlafê de cih digirtî lê ji bo alternatîfê rêveberiya xweser ava bikin, tevî li Eniya Aştî û Azadiyê bûye ku ji ereb, kurd û suryanan pêk tê. Begdaş diyar kir ku wan ji bo vê berê xwe daye Tirkiyeyê û wiha pê de çû: "ENKS dibêje ew bi armanca ku eniya xwe bi Tirkiyeyê bidin nasîn û bibin


xwedî rol, çûne Tirkiyeyê. Wan di hevdîtînê xwe de ku bi nûnerên dewleta tirk û îtîlafê re kirine, xwestine ku li deverên heta niha di bin kontrola îtîlafê de ne, ofîsên xwe vebikin. Tiştên ku di ragihandinê de derketin pêş ev bûn. Yanî ENKS'ê heta niha jî xwe ji siyaseta Tirkiyeyê rizgar nekiriye. Mînak di nîqaşan de hê heta niha peyva 'Tirkiye dagirker e' qebûl nekiriye.

Begdaş destnîşan kir ku ENKS'ê li Tirkiyeyê bi nûnerên Amerîka û Fransayê re jî hevdîtîna kirine û domand: "Wek tê zanîn serokê îtîlafê Nasir Harîrî jî piştî re çû Başûr bi Mesûd Barzanî re hevdîtîna kir. Ev hemû jî girêdayî hev in. Yanî dixwazin nakokiyên heta niha di navbera wan de derketine ji holê rakin, li hev bikin û plan û siyaseta xwe ya nû deynin. Jixwe di ragihandinê de ev yek anî ziman. Wezareta Karên Derve ya Tirkiyeyê jî ENKS re got ku fikarên wan ji diyaloga kurdî-kurdî hene; li hemberî wê wan got ew ê bandora PYD'ê kêmbikin ku rola wan jî zêde nemîne. Li gorî agahiyan hin nûnerên ENKS'ê bi me re parve kirine, armanc ew e ku tesîra PYD'ê di nav diyaloga kurdî-kurdî de kêmbikin. Jixwe di rastiya xwe de jî dema em îro helwesta ENKS'ê yê li hember diya-

logê dinihêrin, em livandina wan a ji bo berjewendiyên dewleta Tirkiyeyê jî dibînin. Ev ne berjewendiyên ji bo Rojava û gelê kurd in."

Sedema aloziya li Başûr...

Her wiha endama Diyaloga Kurdî Sema Begdaş der barê aloziya li Başûr a di navbera hêzên kurd de didome, axivî û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ev êrişên dewleta tirk ên li Başûr, Bakur û Herêmên Parastinê yê Medyayê bi taybetî piştî diyaloga kurdî-kurdî dest pê kirin. Em dizanin ku tîkiliyên tirkan û PDK'ê ev demekê dirêj e hene. Ev tîkîlî îro çawa dibin sedema birakujiyê? Şereki bi vî rengî dê bandoreke neyînî li hemû perçeyên Kurdistanê bike. Îro hewce ye bi dehan partiyên kurd ên li Bakur, Başûr, Rojava û Rojhilat, ji bo hev bibin hêz û pirsgerêkên xwe çareser bikin. Îro ruhê neteweyî di dilê her kurdî de heye. Me di ruhê Kobanê de dît ku bi sedan ciwan ji Bakur û Başûr tevî li berxwedanê bûn, pêşmerge tevî bûn. Şengal bi hev re parastin. Di şoreşa Barzanî de jî ji her çar perçeyên Kurdistanê kurd tevî li şoreşê bûn. Yanî ji ber vê em mecbûr in, îro bi ruhê neteweyî werin ba hev û hevdu biparêzin. Hêza me di yekitiya me de ye!"



Xweşkanî

Felemez Ulug

Civaka ji bo azadiya xwe tîdikoşe

Li Şengalê rewş her diçe xirabtir dibe. Tevî hemû hewldan û xebatên Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê li gel rayedarên Iraqê jî metirsiyên li ser herêmê didomin.

Her diçe ruyê reş ê peymanînkarkirina îradeya gelê Şengalê ya di 9'ê cotmehê de ji hêla PDK, Bexda û dewleta tirk ve hatî mohrkirin, hîn zêdetir tê famkirin.

Ev peymanînkarkirina xwe-parastinê, xwebirêberîna û aramiya herêmê dike hedef, bi planên Amerîka û dewleta tirk ve girêdayî ne ku li ser herêmê hatiye çêkirin.

Li gor peymanînkarkirina Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê tê xwestin ku rêveberiya herêmê radestî hêzên iraqî bê kirin. Dîsa divê YBŞ û YJŞ çekên xwe radestî artêşa Iraqê bikin.

Bêguman ev peymana vekirî ya qirkirina civaka êzîdî û tunehesibandina îradeya wan e. Bi awayekî aşkera derdikeve holê ku alî yan jî dewletên bi

destê DAİŞ'ê nikarin civaka êzîdî teslîm bigirin û kontrola herêmê tîxî destê xwe dixwazin bi vê peymanînkarkirina armanca xwe. Jixwe ji despêka Şengalê ji çeteyên DAİŞ'ê hat rizgarkirin ve, MÎT'a tirk û PDK'ê jî bo aramiya herêmê xira bikin çî ji destê wan tê dikin. Bi balafirên şer êrîş birin ser gel, di her firsendê de bi destê komên çete êrîş kirin. Dîsa jî gel di xwesteka xwe ya azadiyê de îsrar kir. Ev jî bi temamî dûtî stratejiya PDK'ê û dewleta tirk bû. Lewma peymanînkarkirina Hewlêr-Bexda-Enqereyê bi lez û bez, bi dijwarî û xeteriya qirkirinê ya li ser civaka Şengalê ket meriyetê.

Di wan rojên dawî de, bi hezaran hêzên artêşa Iraqê, wesayîtên zirxî û alavên leşkerî yê herî giran sewqî Şengalê hatine kirin. Seranserê sînorê Rojava-Şengal hatiye dorpeçkirin, cih û rêyên stratejîk ên Şengalê hatine girtin. Her wiha dixwazin di serî de li navenda Şengalê, li tevahiya Şengalê

bi cih bibin û her derê bixin bin kontrola xwe.

Hêzên ku di 2014'an de gel bêparastin hiştin û bûn sedem ku DAİŞ komkujiyê pêk bîne, îro jî bo xirabkirina hîn mezin dixwazin vegeherî herêmê. Gelê herêmê di ferqa van lîstîk û planên qirêj de ye.

Li hemberî van planên qirêj di serî de Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê û pêkhatiyên herêmê ketin nav liv û tevgerê. Ji bo ev peymanînkarkirina Amerîkayê ya di navbera Hewlêr-Bexda-Enqereyê de hatiye îmzekirin bêhukim bibê li Bexdayê hin hevdîtîna pêk anî. Tevî hemû hewldanên aştîyane yê şênîyên herêmê xwediyên peymanê di înkara îradeya gel de îsrar dikin.

Bêguman ev peymanînkarkirina komployek berfireh ya li ser civaka êzîdî tê meşandin e. Parçeyekî komkujîya 3'yê Tebaxa 2014'an ya li ser Şengalê û Mexmûrê pêk hatiye. Hêzên ku di wê demê de negihîştin armanca xwe niha

dixwazin bi fen û fitneyan bi ser bikewînin. Li Mexmûrê bi destê PDK'ê li ser gel ambargo tê meşandin û kamp bi awayekî hişk hatiye dorpeçkirin. Dîsa PDK li ser xeta Herêmên Parastinê yê Medyayê hêzeke ji çeteyan pêk tê bi cih kiriye. Bi wê PDK bi awayekî aşkera dixwaze bêje; "Ez ê nehêlim kes bi hawara şengaliyan ve were lê gerek hûn jî paqij bikin."

Çî jî kê paqij dikin! Kesên li herêmê ne xwediyê wê axa pîroz in. Civaka herî kevnar û xwedî baweriye. Civaka ku herdem bi komkujîyan re rû bi rû maye ye. Civaka ku tevî hemû êş û azarên kişandiyê di aştî û azadiya xwe de îsrar dike ye. Civaka ku heya niha zirara wê negihîştîye ti kesî ye. Ev civaka herdem bi zextan û bindestyan re rû bi rû maya di dîroka xwe de cara yekem e ku xwe bi rêve dibe. Cara yekem ku di derbarê xwe de biryar digre. Cara yekem ku dibe xwedî îrade û hebûn.

Ji ber vê yekê li ser axa xwe bi pa-

rastina xwe û rêveberiya xwe, bawerî û çanda xwe dijî. Bi hemû pêkhatiyên li herêmê di nav aştîyê de dijîn. Ev çanda ku pêwîst e ji bo hemû Iraqê bibê çavkaniya moral û xwerêberîna di rojame ya îroyîn de dibe hedefa hin hêzên li pey berjewendiyên xwe ne.

PDK û rêveberiya wê serkêşî jî wê plana qirêj re dikin. Di feraseta PDK'ê de ev heye: "Ger ne ya min be bila ne yakesî be." Ji ber ku êdî gel bi PDK'ê ne bawere, di ferqa lîstîk û planên wê de ye û naxwaze ew vegere herêmê, PDK wê bi serê gelde tîne.

Niha rewşa herêmê her ber bi xerabiyê ve diçe. Ji bo şerek neqewime di serî de Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê û hemû pêkhatiyên herêmê di nav xebata pir mezin de ne.

Gelê Şengalê êdî tama jiyana azad girtiye. Êdî di ferqa jiyana azad û demokratîk de ne. Ji ber vê yekê bi hemû pêkhatiyên xwe ve ji bo xwe biparêzin amade ne.

Leşker sewqî Şengalê kirin

Navenda Nûçeyan

Di 9'ê Cotmehê de di navbera hikûmeta navendî ya Iraqê û hikûmeta bashûrê Kurdistanê de ji bo kontrolkirina Şengalê peymanek hatibû danîn. Li hember vê peymanê ji meha cotmehê ve gel, sazî û parlamenter û siyasemedarên kurd ji her çar parçeyên Kurdistanê het bi Ewropayê bertek nîşan didin û nerazîbûnên xwe tînin ziman.

Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê ku 23'yê mijdarê bangeke lez-gîn kiribû, ev hewldan weke fermaneke nû pênase kiribû û xwestibû ku her kes li dijî vê bisekine.

Li gel van bertekan jî piştî peymanê Hewlêr û Bexdayê artêşa Iraqê di 24'ê mijdarê de 2 hezar û 500 leşkerên xwe sewqî Şengalê kirin û piştî wê du rojan jî hejmara leşkeran 3 qat zêde kir. Li gor agahiyên hatine parvekirin herî dawî 8 hezar leşker hatine sewqkirin. Her çiqas hikûmeta Iraqê îdîa kiribû ku hêza leşkerî ya li Şengalê wê bê guher-tin û veguhastina hêzê wê ji bo sînor bê kirin lê belê hêzên ku berê hatibûn şandin ji herêmê nehatin derxistin û di ser re yekîneyên polîsan ên nû û hêza operasyonî ya Hikûmeta Federal a Iraqê lê hatin zêdekirin.

Der barê peymanê Hewlêr-Bexdayê û sewqiyata artêşa Iraqê de em bi rojnamegera ji Başûr Leyla Lorîn re axivî.

Lorîn di axaftina xwe de diyar kir ku artêşa Iraqê dest bi sew-



Piştî lihevkerina Bexda-Hewlêrê ya ji bo kontrolkirina Şengalê, artêşa Iraqê 8 hezar leşker sewqî herêmên Şengalê kirin. Rojnamegera ji Başûr Leyla Lorîn tîkildarî mijarê axivî û diyar kir ku sewqiyata li Şengalê didome. Gelê Şengalê jî vê rewşê nerazî ye û bertekan nîşan dide



qiyata leşkerî kiriyê û li hember vê yekê jî gelê êzîdî bertek nîşan dide.

Armanc derxistina gelên êzîdî ye

Rojnameger Leyla Lorîn di axaftina xwe de diyar kir ku armaanca peymanê di navbera Hewlêr-Bexdayê de derxistina hêzên ku ji aliyê gelê Şengalê ve hatine avakirin e û ev tişt anî ziman: "Ev demek dirêj e ji aliyê dewletên mezin û hikûmeta herêma Kurdistanê û Iraqê ve planên qirêj li ser Şengalê, rêveberiya xweser a Şengalê tînin kirin. Li gorî wê lihevkerinê dê hêzên ku di dema DAIŞ'ê de ji Şengalê reviyên û di serî de civaka êzîdî, gelên wir di nav lepên çeteyên DAIŞ'ê yên hov de hiştin, careke din dixwazin vegehin Şengalê û hêzên ku ji aliyê gelê Şengalê ve hatine avakirin û ew parastine, ji Şengalê bînin derxistin. Di vê peymanê de tê gotin, ew ê biçin îdare û heybeta dewleta Iraqê û hêza nûnertiya revok li Şengalê ava bikin!"

8 hezar leşker

Leyla Lorîn destnîşan kir ku artêşa Iraqê weke gava yekemîn

hêza xwe ya leşkerî şandiyê Şengalê û li hin deveran bi cih bûye û wiha domand: "Li gorî agahiyên rojane em digirin, hejmara wê hêzê gihîştîye 8 hezar kesan. Niha ev hêz ji gundê Medîban, Sîba Şêx Xidir heta çiyayê Kolik ku herêmên sînor in bi cih bûye. Dîsa li gorî agahiyên ji çavkaniyên, artêşa Iraqê hatine bidestxistin, ev hêz wê heta bajarokê Rebîa bikin bin kontrola xwe. Bi vê yekê sînorê di navbera Şengalê û rojavayê Kurdistanê de bi giştî dikeve bin destê artêşa Iraqê."

Dubare Şengalê tê dagirkirin

Rojnameger Leyla Lorîn bal kişand ser fermanên ku di dîrokê de hatine serê gelê êzîdî û wiha pê de çû: "Herî zêde gelê êzîdî, civaka êzîdî û jinên êzîdî bûn hedefa êrîşên çeteyên DAIŞ'ê. Wan pes nekir û ji bo jiyana azadiya xwe têkoşayan. Jin û dayik bi vîn, reng, deng û tevlibûna xwe li hemberî wan êrîşên hovane yên çeteyên DAIŞ'ê fedekariyên mezin raber kirin. Ji bo wê careke din civaka êzîdî ya xwe piştî fermana 3'yê Tebaxa 2014'an bi rêxistin kir, jinên êzîdî yên xwe bi azadiyê û bi xwebûnê avaki-

rine, şengaliyên xwedî şeref û rûmet, dê careke din rûmeta xwe nexin destê dagirkeriya qirker ku dixwazin welat û cihê wan, bi vê lihevkerina di navbera hikûmeta navendî ya Iraqê û heremê Kurdistanê de careke din dagir bikin."

'Fermaneke nû'

Her wiha Lorîn da zanîn ku piştî peymanê dagirkirina artêşa Iraqê ji aliyê gelên Şengalê ve rastî bertekan hatiyê û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ev peyman ku bi alîkariya Neteweyên Yekbûyî jî hatiyê danîn, em dikarin bêjin ku ji bîdengiya siyasemedar û parlamenterên Başûr jî hatiyê înzekirin. Tê zanîn ku gelê Şengalê hatina artêşa Iraqê û bi taybetî jî peymanê wek fermaneke nû bi nav dîke. Ji 9'ê cotmehê ve gelê Şengalê yên xwe bi vîna azadiyê bi rêxistin kiriyê li dijî planên heyî di nav têkoşin û berxwedanê de ne. Bi çalakiyên xwe bi vîna xwe, ji dagirkeran û xayînan re dibêjin, kesên ku îradeya me qebûl nekin, em wan careke din bi tu şewazî qebûl nakin. Dîsa dibêjin xayînan ku em di lepên çeteyên DAIŞ'ê de hiştin, em ê careke din nehêlin lingên wan bê ser axa Şengalê."



Hevdîtinên şandeya KNK'ê

Bi dagirkirina herêmên li Başûr ên wek Zînî Wertê, Garê, Rewanduzê û hwd. di navbera hêzên kurd de bûbû sedema aloziyan. Ji ber vê yekê jî gelek siyasemedar, sazî, gel û derdorên bertek nîşan dan. Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) li ser metirsiya şer û girîngiya yekitiyê şandeyek ava kir û şandeyê di rojên borî de dest bi hevdîtinên xwe yên li Başûr kir.

Şandeya ku hevserokê KNK'ê Ehmed Qeremus û endama şandeyê Asya Abdullah jî di nav de cih digirin, pêşî bi rewşên, rûspî û xelkên herêma Raperînê re civiyabûn. Di vê hevdîtinê de xelkên herêma Raperînê gotin ku tenê yekitiya neteweyî dikare planên dijiman ên li ser gelê kurd tune bike.

Şandeya KNK'ê di 20'ê mijdarê de ji bo girîngiya yekitiya neteweyî dest bi hevdîtinên xwe kirin. Heta niha li Başûr sazî û partiyên wek; Partiya Parêzgarên Kurdistanê, Hizba Zehmetkêşan a Kurdistanê, Emîrê Komela Îslamiya Kurdistanê Elîf Bapîr û herî dawiyê li Hewlêrê jî bi Tevgera Demokratîk a Gelê Kurdistanê, Yekitiya Neteweyî ya Demokratîk a Kurdistanê, Yekitiya Parlamenterên Kurdistanê re hevdîtinên xwe berdewam kirin.

Hevdîtina dawî ya şandeyê ya bi serokê Bizûtneweyî Demokratîk a Gelê Kurdistanê Xidir Rûsî û serokê Yekitiya Neteweyî ya Demokratîk a Kurdistanê Xefûr Mexmûrî re hat kirin. Şande li Hewlêrê cara duyem serdana Yekitiya Parlamenterên Kurdistanê kir. Herî dawî şande û Yekitiya Parlamenterên Kurdistanê bi hev re şewra pêxistina diyaloga navxweyî bi rêya online li dar xistin.

HEWLÊR

Hişê azad neteweya azad ava dike

Hisên Çatikkaş

Ziman tiştên hişê mirovan derdixîne holê. Heke hişê mirovan bîndest be, bêguman wê ziman her tim bîndestî mirovan derîne derve lê heke hiş azad be, dîsa bêguman wê ziman her tim li gorî azadiya hiş tevbigere û wê azadiya hiş derîne derve. Hişê mirovê xwe jî bîndestîyê rizgar nekiribe, helbet ziman wê nikaribe behsa azadiyê bike. Lewma em dikarin bêjin ku bîndestîya hiş an jî azadiya hişê rîşanî zimanê mirovan dide û li gorî wê ziman gotinên xwe çêdike. Ji ber ku ziman li gorî hiş tevbigere ango gotinên hiş bi zimanê gotin bîndestî û azadî ne yên ziman in, bêguman ên hiş in.

Em dikarin bêjin ku hê hinek kurd nebûne kurd! Beriya her tiştî di vê sedala netewe-dewletan de divê em kurd bibin kurd. Heke em bibin kurd wê demê em ê bibin netewe jî. Li ser bin-

gehê nijadê netewe ava dibe. A rast ziman û nijad bi hev re nijadiyê ava dikin. Ji bo nijadê jî perwerde û malbat sazîyên sereke ne. Mixabin em kurd nebûne xwediyê perwerdehiyê bi rêk û pêk, lewma ev hêla me qels maye. A din jî hêla malbatê ye ku ew jî bi salan e di bin piştaftinê de ye û bi awayekî bi rêk û pêk ji aliyê dewletên mêtînger ên welatê me ve hatiyê pûçkirin. Ji ber van her du sedeman aliyê me yê nijadî/bûnê pir qels e.

Ji ber van sedeman e ku em kurd hê qala avakirina yekitiyê dikin. An jî hê nikarin têkoşîneke hevpar li hemberî mêtîngerên kurdîstana xwe li dar bixin. Dev ji têkoşîna hevpar berdî, em hê qala şerê birakujiyê dikin. Em hê bi hev re şer dikin û dijminatîya hev dikin. Ji ber van sedeman e ku kurd hê evîndarên zimanê mêtîngerên welatê xwe ne; ji ber van sedeman e ku kurd jî ber êrîş û zordestiya mêtîngerên axa xwe dibin

penaber û li welatên din bi cih bûne jî dibêjin "em ji Tirkiye, Îran, Iraq, Sûriyeyê ne". Gelo ma kurdekî/e penaber nikare bêje ku ez ji Kurdistanê me? Helbet bersiva vê pirsê aşkera ye û bi awayekî aşkera li her derê dikarin bêjin ku em ji Kurdistanê ne. Jixwe ji ber vê gotinê wê kes wan suçdar neke û zordestiyê li wan neke lê çima ev gotin ji hişê me bi rêya zimanê me dernakeve.

Ji bo mirovên di bin mêtîngerîya dewletekê de qutbûna ji dewleta mêtînger ferz e. Lewma tiştên ji destên wan tînin divê bikin, ji bo wê jî her rê mubah e ango serbest e. Çi ji kê tê, divê teksîr neke. Têkiliya bi mêtîngeran re ya li ser qebûlkirina mêtîngeran guneh e û di heman demê de ne wijdanî ye jî. Jixwe tiştê ne wijdanî, ne xlaqî ye.

Tiştên neteweyekê dikin netewe ziman, çand, ... , û ax in. Lewma kesên di bin mêtîngerîyê de ne divê xwedî plan û

stratejiyên demkurt û demdirêj bin. Yek ji van stratejiyên demkurt qutbûna ji zimanê mêtîngerîyê ye. Beriya her tiştî divê mirovên li vir tîkiliya xwe bi zimanê mêtîngerîyê re çûn bikin. Ji bo wê jî divê di her qad û mercê de axaftina bi zimanê xwe israr bike. Stratejiyêke din a demkurt qutbûna ji çanda mêtîngerîyê ye. Bi her awayî redkirina çanda mêtîngerîyê jî li ser kesên di bin mêtîngerîyê de dijîn, ferz e. Gelek kes di bin navê cuda yên wek "çand, wêje, muzik gerdûnî ye" de naxwazin xwe ji çand û hunera mêtînger qut bikin û di heman demê de dixwazin xwe bi çand û hunera mêtînger li ser civakê ferz bikin û xwe bi civakê bidin qebûlkirin lê ev gotin û tevger ji hincetên xwe heyîkirinê wêdetir ne tişteke din e. Bi van gotin û tevgeran, xwe dixapînin û ya rastir ew kes naxwazin ku xwe ji mêtîngerên axa xwe qut bikin. Bi vî awayî em dikarin stratejiyên demkurt zêde bikin lê ji bo fêmkirina mijarê ev mînak

têrê dikin. Ji bo stratejiyên demdirêj jî ya herî girîng rizgarkirina axa welêt a ji mêtîngerîyê ye. Ji bo wê jî çî bî kirin weke rojî û nimêjê yan jî îbadetên olan ferz e. Di heman demê de ev bareke li ser milê hemû kesên ku axa wan di bin mêtîngerîyê de ye. Lewma ji bo rizgarkirina axa welêt ji mêtîngerîyê kî çî dîke û bi çî awayî dîke, bêşik û bêguman divê bê destekirin. Ji ber ku hemû rêbazên li hemberî mêtîngerîyê bêsuc û bêguneh in ango helal in weke şîrê dayikeke kurd.

Bêguman stratejiyên demkurt û demdirêj hemû bi hişê mirovan ve girêdayî ne. Lewre beriya hemûyan divê mirov hişê xwe ji mêtîngerîyê rizgar bike. Heke hiş ji mêtîngerîyê rizgar nebe mirov dê nikaribe behsa stratejiyan jî bike. Rizgarî an jî azadiya hişê wê rê li ber rizgariya ziman, çand ... axê veke. Di heman demê de di sedema neteweyan de wê me jî bike netewe. Heke em bibin netewe em ê ji bîndestîyê/mêtîngerîyê jî rizgar bibin.



Dr. Abdulillah Polat

Korona barê psîkolojîk ê mayînde ye

Korona her tiştî diguherîne. Qadên giştî ji şeş mehan zêdetir e kêm zêde hatine qedexekirin. Ji bo her tiştî, ji çûyîna dibistanê heya çûyîna xwaringehê rêzikên girêdêr hene. Di encamê de, mirov di rewş û tevgerê neyînî de radibin û giyanên mirovan bi taybetî ji vê rewşê êş dikişînin.

Sala 2020'an li seranserê cîhanê ji bo karmend, jin, zarok û zilaman ango ji bo tevahiya civakê sala herî streskar e.

Di encamên lêkolîna Oracleyê de ku çêkerê nermalav û alavên amerîkî li seranserê cîhanê ji da-wiya tîrmehê heya destpêka tebaxa 2020'an, li ser 12 hezar û 347 kesan lêkolîn kiriye. Daneyên wan hene ku vê dadrêsê xurt bikin. Li gorî lêkolînê, nexweşiya Kovîd-19'ê li seranserê cîhanê bêtir stres û fikaran çêdike.

Dibistana Birêvebirinê ya Navneteweyî (ISM), di lêkolîna xwe ya li ser stresa psîkolojîk a pandemîk de, destnîşan dike ku rewşa heyî li ser mirovan stresek cidî çêdike û ji ber vê yekê jî derketina nişaneyên nexweşiya giyanî, her wiha ew dikare ber bi asteke krîtîk ve bibe. Bi gotineke din, divê neyê jîbîrkirin ev

tişteke wisa ye ku bi paşxana takekes û genetîkî ve girêdayî ye. Ev rewş di heman demê de ji bo depresyonê zeviyekê çêdike. Pêşniyarên wekî firehkirin an jî nû ve aktîfkirina torê balkêş in.

Pandemiya koronayê li ser mirovan bandoreke pir dijwar dihêle û di mirovan de jî tevliheviyek xetere çêdike. Rewşa krîzê hema hema her kes di dereceyên cuda de bandor dike û hem jî nexweşên giyanî û mirovên saxlem jî ji stresê dikişînin. Li aliyekî din, bêwêlehî, tirs a li ser tenduristiya xwe û tenduristiya mirovên din, tirs a hebûnî ya der barê pêşerojê de û nezela-liya dijwar a derheqê pêşveçûnê de, bêtir a krîzê, stresên mezin nîşan didin û bandoreke neyînî li jiyana mirovan dikin.

Di jiyana rojane de ji ber pandemiyê, tîkiliya civakî ya di navbera mirovan de, pir hindik nezîkbûna laşî, guherînên girîng, bi serê xwe pirsgrîk in. Bi taybetî dema ku mirov rastî cezayek wiha tê, ev dibe sedema derketina tiravmayên tecrîda kesan e. Divê em di rewşê wiha bikîz de, xetereya mezin a li ser tenduristiya giyanî ya em xwe kêm nebînin, ji ber ku

bilez bikêrhatî ye ku em diyar bikin hema hema tu tecrûbeyên me tune ne ku em bikaribin ji bo bi rewşê wisa aloz re rû bi rû bimînin û tecrûbeyên nû hewce ne. Mirovên ji bo wan empatî hêsantir e, bi gavên berbiçav ên koronayê baş dibin. Ev yek jî hêla lêkolîneke nû ya zanîngeheke danîmarkî ve hatiye piştraskirin. Wekî tê daxuyandin, rûbirûbûna bi mirovên di bin xetereya vîrusê de jî dilrehiyê zêde dike.

Lêkolînerên ji zanîngeha Aarhus, Danîmark, di kovara "Zanista Psîkolojîk" de dinivîsin û destnîşan dikin ku gengaz e dilovaniya mirovî zêde bibe û ji ber vê yekê jî şopandina tedbîran girîng e.

Wekî din, pandemî bi xwe re hin aliyên tîpîk ên ku mirov pê re zehmetiyê dikişînin tîne. Wekî mînak tehdîdek ku em nikarin rasterast jê fam bikin û bandor bikin. Hêjayî gotinê ye ku ev bi gelemperî dibe sedema hesta wendakirina kontrolê. Ji ber ku rewşa krîzê di dereceyên cuda de hema hema li her kesî bandor dike, mirovên bitendurist û hem jî mirovên derûniya wan nebaş di bin stresê de ne.

Di heman demê de, divê em ji bîr nekin ku em di fêrbûnê de çi çiqas jêhatî ne û kîjan derfetên me hene ku em baştir li hember krîzan bisekinin. Bi hin mirovên ku bi nexweşiya giyanî re rû bi rû mane, hate dîtin ku ji krîzek bi bandortir, ji stresên psîkolojîk ên di encama nexweşiyên de peyda dibin, wek nexweşiyên ji ber fikarê yan depresiyonê ne. Bi gotineke din, hate îsbatkirin ku pergala parastinê yê mirovên wisa di pêvajoya pandemiyê de ji mirovên "saxlem" berxwedêrtir in. Van mirovan berê stratejiyên tenduristiya derûnî yê kesane bi dest xwe xistine û ew dikarin di jiyana xwe de bi kar binin. Nemaze tecrûbeyên ku bi terapiyê bi destê xwe xistine. Giliyên ji kirîza koronayê dikarin bi awayên cuda pêk werin.

Pandemiya koronayê di gelek astan de bûne sedema stresê lê hêjayî gotinê ye ku berfirehiya encamên pisîko-sosyal ên demdirêj dê tenê di mehên pêş de bidin der. Ji ber şewba Kovîd-19'ê, zirara hestên mirovan, tevlihevî û nişaneyên fikaran derdikevin pêş. Ji destpêka krîza koronayê ve, raporên nexweşiyên tîkildarî teşhîsên derûnî zêde bûne.

Stresa pisîkolojîk dikare ne tenê bi nişaneyên psîkolojîk ên wekî fikar an depresiyonê lê di heman demê de bi giliyên fizîkî de jî xwe bide der. Di heman demê de ew dikare xwe bi nişaneyên laşî yê mîna stresa hestiyar, dilketin, kurtbûna bêhnê, tengasiya sîngê, giliyên gomes-testînal, gêjbûn, serêş û nexweşiyên xewê xuya bibe.

Gava gilî tînin kirin, pir girîng e ku mirov di hundirê xwe de hest bike bê ka ez çawa me û çî dikare bibe alîkar ji bo min. Bikêrhatî ye ku mirov bi hînbûnê hişmendiyê bizanibe û bikaribe bi rêk û pêk li rewşa derûnî ya berê venegere.



Samî Hêzil

Lêgerîn

Em li tişteke digerîn, li gewherekê, li wateyekê, li îspatekê... Em tev lê digerîn, reng e ku li heman tiştê digerîn lê bi wesfên cuda, bi navlêkirinê cuda û bi terfîrên cuda; tişteke ku me li nav hûrgilî û tevliheviyên rabirdûyê winda kiriye, yan jî em di vê baweriyê windakirinê de ne. Belkî ji bo me hinekan ne windakirin be bes ji me hatibe dizîn an jî hatibe veşartin. Em li çî digerîn û çîma lê digerîn? Bersiva 'çî' yê tîkîlhev e. Dema me ew dît hingê em dikarin navekî lê bikin û pîrsa der barê 'çî' yê de ji holê rabikin. Famdarî ye! Lê ka çîma! Ev lêgerîna me belkî mîrat be ji dîroka me, yan jî qeder be ji erdnîgariya me. An jî hema arketîpek be ji pêşiyên me, wek a zimanzanên ku ketin pey zimanê destpêkê yê aryanî, wek a wergêrên suryanî yê ku bi sedan salan li çol û newalên Mezopotamyayê ketin pey peyama wînda, wek a alimên Beytul Hikmeyê yê wate-ger, wek a cîhûyên ku razên Kabalayê kêlî li kêlî li hev kirin û hemû lêgerên din...

Ji bo bersiva 'çîma' yê ihtîmalek jî di hizra neteweperweriyê de xwe dide nîşan ku Anthony D. Smith di Mît û Bîranînê Neteweyê de vê ihtîmalê di serê mirov de bi cih dike. Camêr, ferqa navbera modela rojava û rojhilat a neteweperweriyê wiha destnîşan dike: Di navenda modela rojava ya neteweperweriyê de sînorê neteweyî, qanûn û sazîyên neteweyî, wekheviya hemwelatîyan a li pêş qanûnê û yekîtiya civakeke polîtîkî heye. Berovajî vê, modela rojhilat bala xwe dide koka etnîk û girêdanên çandî. Di modela rojhilat de çalakî û tevgerên gel ên girseyî girîng in ku ew jî bi vejandina çanda gel a ji nû ve keşîf kirî derdikeve holê. Vêca yê wê keşfê dikin jî entelektuelên bajarî ne, anku zimanzan in, dîroknas in, etnograf û ferhengnas in. Vêca li gorî tespîta Smith em şîrove bikin; dibe ku sedema wê azwariya me ya lêgerînê jî pêwîstiya xwe girêdanê tê, aîdbûna bi kok û rehêkê, yekbûna bi paşerojêke qedîm û şêlû. Girêdaneke wisa ku erka ve-sazkirina kok û girêdana qedîm bîne cih û pê re jî bibe hecetek bikêrhatî ji bo livandina civaka bêlebat. Lewre, wek tê zanîn, mixabin em dereng gihîştin rawestgeha neteweyî û ji ber vê derengmayînê jî hîseke nîvco, kêmasiyeke watedayînê û liberxweketineke neçar ji me venaqete.

Her çî be jî sedem, bayê lêgerînê jî me venaqete. Hin ji me li destxetan digerîn, li tomarên kaxizan. Ji wan tomarên berdest cudatir, ji wan wêdetir. Li kakîlekê digerîn, li fikrekê û bûne muhtadên kaxezên rizî. Bi rengê kaxezê zerbûyî, hibra belavbûyî û nivîsa beqembûyî aramiyê digerîn. Her çiqas li ber destê me bi tîra hejandina cîhanê kelamên xurt, kaxez û nivîs, bawerî û fikr hebin ku lêgerînê pêş me ew dîtîbin û nexşe li ser xistîbin jî dîsa lêgerîna me berde-wam e. Hin ji me li argumanekê digerîn di nav anektodeke dîrokî de, li nîqaşêke qedîm, li destpêka destpêkekê digerîn. Hin ji me di paşerojêke de çîk bûne, her wekî li dorhêlê çemberek hatibe kişandin. Li pey hesabên duh in, hesabên nîvco. Li pey pîrsa pûç a kî heq, kî neheq in.

Em ketine li pey peyvên jîbîrbûyî, bi tîrsa ji nû ve windakirinê. Em timî hewldî didin ku peyvên êdî li ser zar û zimanê me nagerin bi bîr binin û tînin bîra hev. Bi satilan ji bîrdankên ta-kekesan dikişînin jor û direşînin li ser erdê ku meyla wê ber bi zuhabûnê ve ye. Em li wargeheke çanda qedîm digerîn: Ji me hin kes xezîneya Êzdiyên koçber ên Yêrevanê tesnîf dikin, qîmeta wan a li bazara îro dihesibînin; hin ji me li welatên bejî yê wê wê Xorasanê meydana cîrîtê dixwazin û mizgîniya birayê me yê wînda yê di temenê kal de didin; hin ji me jî berê xwe didin labîrentên arşîvên biyanî û tê de li şopa tişteke binas, li sûreteke digerîn. Belê gera me berde-wam e, ya bi xêr!

Divê em bînin bîra xwe ku rastîyeke tahl jî heye: her ku em bi vî awayî bi paşerojê re mijûl in û bi xewnên xweş ên vî nostaljiya şîrîn sermest in, ji hêlekê ve îro li ber me diherike û ji hêla din jî sîberoj bi ser me de tê.



Devê deriyê mala xwe bimala



Seyidxan Anter

Dozgerê DOZA PALME Krister Petersson, kuştina Olof Palme xist stuyê "Skandia manen", Stig Engstrom ê miriye. Maqamên dewletê dawî bi doza Palme anîn. Her çiqas nivîskar û rojnamevan ji vê yekê razî nebûn jî. Yek ji wan Gunnar Wall e û dibêje: "Ez wekhevînekê di navbera despêk û dawî lê anîn û lêkolîna vê dozê de dîbînim; her du jî bê delîl û îspat in."

Gava ku Olof Palme ji sînemaya Grand derdikeve û peya diçe malê, li gorî radyo û TV' a siwêdî, êvara 28'ê sibata 1986'an, saet 11:30 - 11:38'an de Olof Palm bi du derban birîndar dibe û saet 12:04'an de li nexweşxaneyê Sabbatsbers can dide.

Van rojan kurd û rêxistinên wan ên li Siwêdê, li dijî neheqiyên li hember kurdan civîn û çalakîyan

dikin. Hûn bi çirokê dizanin. Berpirsiyarê teşkilata polîsan Hans Holmer derew, bêbextî û çavsofî li kurdan û hin rêxistinên wan kiribûn.

Dema Olof Palme kuştin ez li bajarê rojhilatê Siwêd, Goteborgê dijiyam. Êvara şemiyê ya 28'ê sibata 1986'an, di navbera saet 07:00 - 09:00'ê êvarê de li şanoya bajêr a li Gota Platsenê, ez di pêşengeha tevgera li dijî rasîzmê de beşdar bûm. Rojnimeyên bajêr agahî li ser vê çalakiyê weşandibûn. Piştî bi çendakî, gava ez ji kar hatim malê, li hundir sê qerases li benda min bûn. Ciwanmêrên hatibûn, ez bi xwe re birim ifada min girtin û ez serbest berdarm wek gelek kurdên din.

Dîmenek ji ber encama huner û kirinên Hans Holmer hate ber çavê min. Melûlî, bêhêvîti, pîrs, tîrsa û xofa ku li cem kurd û bêganan (xerîban) çêbûbû.

Hans Holmer gelek kambaxî bi serê kurdan anîn. Helbet hin "kov-boyên" kurdan ku gef li xelkê xwarin û roj li nîvro gule berdidan xelkê, ji zû de av li aşê Hans Holmer û tîma

wî kiribûn. Hinek kurd jî erzan tevgeryan, mohra terorîzmê li kurdan û nemaze li PKK'ê hate dan. Heta îro jî bi ser wê de ku Dadgeha Bilind a Belçîkaya ew îtham pûç kiriye jî kî rabe êrîşî kurdan bike ji wan re diserife. Mohre terorîzmê, li serê kurdan bûye bela reş!

Berê dewlet û hikûmeta Siwêdê serî di ber de ev mohra hanê li kurdan da. Anha, poşmaniyeke fedîkoyî ji ruyên berpirsiyarên dewleta Siwêdê dibare lê hîn ew hêz û cesaretek bi xwe re nabînin ku devê deriyê xwe qenc bimalin. Ne bi tenê Swêd lê her wiha dê kengî dewletên emperyal, nemaze yê mohra xwe li peymanên Sykes Picot (1916) û Lozanê (192) dane û şîrîkê çavsofî û bindestiya li hember kurdan in, bi heft avan qirêja ber malên xwe bişon. Lewra kurdan ji zû de heq kiriye ku mîna her miletekî biryarê li ser çarenûsa xwe bide.

Li her warî çavsofî bûye para bindestan lê derew û bêbextî li gor qanûna esasî ya Siwêdê jî buhayek wê heye ku em ji parêzgeran re dihêlin. Di vî xalê de, mîna Îsa pêxember dibêje, pêwîst e ku kes ji xwe dest pê bikin da ku wê toqa naletê ji stûyê wan bê avêtin. Li dor mafên gelan ên navneteweyî, li dor biryara Dadgeha Bilind a Belçîkayê em dest bidin hev û bi hev re herne pêş, ji ber ku 'dewr û dem ya me ye!'



Erdogan nêeşkeno reforman virazo

Referandûmê 2017 de pergale yew kesî sey dermanê heme çî, sey çareserîya heme probleman bi civatanê Tirkîya dîya qebulkerdiş. La no pergale peynîyê 2 seran de rijîya. Erdogan û hevalbendê xo binê xirbê cê de mendê û hewar kenê

Mehmet Şahîn

Erdogan merdimêko pragmatîst o. Menfîetê xo û menfîetê îqtîdarî serê heme çî de gêno. Mîyanê îqtîdarê xo yê 18 serran de tena hesabêk Erdogani bibî. O hesabê ez do senî îqtîdar de bimana û ez do senî emrê îqtîdarîya xo derg bikera. Qabê ke îqtîdarê xo vinî nêkero çîyo ke nêkero çinî yo. Coka sîyasetê Erdogani sîyasetêk bi fetil û fêti yo. Heme hîle û sextekarî, dek û dolabî sîyasetê Erdogani de estê. Çîyo ke ewro bikero û ewro vajo, eşkeno roja bin seba heminan înkâr bikero û tam tersê vatişanê xo yê ewroyî vajo û bikero. Ey het mawitiş çinî yo. Bêrûmetî de sînor nêşinaseno.

Mutabaqatê Dolmabahçeyê yo tarîxî ke qedera civakê kurd û civakê tirk eşkayêne bibedelno kerd qurbanê menfîetanê îqtîdarê xo yê çîçekî. Eke mutabaqatê Dolmabahçe red nêkerdene û dest bi şer nêkerdene do Tirkîya nêkewtene eno halê xirbeyî. Eke Erdogan îradeyê xo teslîmê Dewlet Bahçelî û Ergenekoniyan nêkerdene do nêbiyêne hêsirê destê înan. La çî heyfo ke Erdogan menfîetê civakan, heme kerdî qurbanê îqtîdarê xo û îradeyê xo zî teslîmê înan kerd.

Bêguman sîyasetê Erdogani ê pragmatîst tenê fetil û fêtan ra pêk nîno. Erdogan şikeno heme dost û hevalanê xo yew bi yew bikero qurbanê îqtîdarê xo. 70 dost û hevalê ke 18 serî verê joy Erdogani reyde bî nika înan ra tenê 1-2 kesî verê Erdogani de mendê. Heme kerdî qurbanê îqtîdarê xo.

Belê, 18 serran de Erdogani qabê pawitiş û dewamkerdişê îqtîdarê xo zaf bedelî dayî, zaf hevalê xo kerdî qurban, zaf fetil û fêti çarnayî. La wina aseno ke redkerdişê Mutabaqatê Dolmabahçe û sero topyekun o ke 5 serîyo vera şarê kurdî de dewam keno, îqtîdarê Erdogani do birijno û ver bi çinîbiyayîşî bero. Îqtîdarê Erdogani

hetê sîyasî û hetê aboriye ra do bin ro. Erdogan vînenê ke têkşîyayîşê xoverdayîşê kurdan mimkun nîyo û bi berzkerdişê nijadperestî henî nêşikeno emrê îqtîdarê xo derg bikero. Coka qabê dergkerdişê emrê îqtîdarê xo kewto mîyanê tay hewldayîşanê bînan. Qabê dewleta Ewropa hetkarîya ey bikera bi lavelav hewar keno înan rê. La vengê ey nêşino joyî. Herkesî çim xo û goşê xo girewtî. Nêwazenê Erdogani bîvinê û vengê ey se bikerê. Qedir û qimetê cey nêmendno. Jo bawerîya xo pê nêano û pêroyê berî heme yew bi yewê serê çimê ci yenê girewtîş.

Erdogan neçar mend edalet û demokrasi biyaro xo vîrî û raynê hewarê xo biresno Ewropa û vajo; "Ma ameyoxê xo Ewropa de vînenê. Ma do ageyrê serê xeta edalet û demokrasiye. Qabê xurtkerdişê edalet û demokrasi ma do reforman virazî û girêdayeyê pergale şima ê kapitalistî bimanî. Ma do qabê pawitişê sermayeyê şima reforman virazî û qanûnê taybetan biveci û goreyê menfîetanê şima têbigeyrî..." Peyra wezirê edaletî ke bi vengêk berz paştî da hewarê Erdogani û fina ke edalet û huqûq wextê ey de nêamo qetikerdiş, qalê çinêbiyayîşê huqûq û edaletî kerd. Veng da mahkemayan û vat; "Verdê wa edalet bêro ca, wazena wa qiyamet biwirzo wê". No hewarê Erdogan û wezirê edaletî A.Gulî çîçek hêviyêk tay derûdoran dir virast. La kerd xo vîrî ke îradeyê Erdogani henî destê ey de nîyo.

Seke ma vat, Erdogan qabê berdewamê îqtîdarê xo şikeno nişkêra verê sîyasetê xo 180 dereceyan bizivirno. La ewro Erdogan sey verê bi tena serê xo nîyo û nişikeno sey her rayan biasanî verê sîyasetê xo bibedelno. Şirikê cey MHP û Ergenekonî yê nijadperst û faşistî estê û Erdogan mehîkûmê înan o. Bêwaştêkê înan nêşikeno gamêk bierz. Şirikê Erdogani nêşikenê fenê Erdogani verê sîyasetê

180 dereceyan bizivirne û destûr nêdanê Erdogani ke eno rihet sîyasetê xo bibedelno û xetê înan ê nijadperest, faşist û qirker ra dûrî bikewo.

Bado ke 11 û 14 aşme de Erdogani hewar kerd û qalê reformanê heq, huqûq, edalet û demokrasi kerd û wezirê Edaletî 13 aşme de paştî da hewarê ey, têdima tay çiyê ke waştêkê înan qirikê înan de verdayî virazîyayî. Bi ey kiryanan heme kesî fam kerd ke nê welatî de û wextê şirikatiya Erdogan û Bahçelî de pêkamîyayîşê reformanê huqûq, edalet û demokrasiye mimkun nîyo. Tenê xeyal o.

Eynî rojan de polîso qatil, ey ke roja Newroze de Amed de Kemal Kurkuto ciwan qetil kerdbî, berat kerd. Qabê şaredarê Stenbolî Ekrem İmamoğlu ropersayîş dest pêkerd, derbarê zelzeleyê İzmirî de xebardayîşê şardarê İzmirî Tunc Soyerî qedexê kerd. Hemwelatiyê ke kuçe de îqtîdarê Erdogani rexne kerd girot eşt heps, serekê çeteyê mafya ke bi efûyê înan ê taybet ame veredayîş serekê partiya muxalîf a herî gird bi awayêko bêexlaq tehdît kerd û gefî ro ci wend û bi ser de şirikê Erdogani Bahçelî ro serekê çeteyî wayir veciya û o pawit. Ya herî muhîm seke Erdogani rê vajê heke reformî viraziyê hewceyo bi qasê serê derzenî menfîetê kurdan di ê reforman de çinî bo û do qirkerdişê înan berdewam bikero û 20 aşme de 24 tera parêzerî qerarê girewtîşê 101 kurdan da.

Bi ser de Bahçelî hewldayîşê reformî sey hewldayîşê fitneyî pênasê kerd û hevalbendê Erdogani ê tewr kehen û qedîmî ra yew Bulent Arinç zî fitnekar îlan kerd.

Şirikê Erdogani Bahçelî û Ergenekoniyan bi nê kiryananê xo ey ra vat, hedê xo bizane, qet qalê reforman meke, ma destûr nêdanê ti sîyasetê xo bibedelne û peymanê ke mîyanê ma û to de yo bixerepnê. Heke ti peymanê mîyanê ma bixerepnê û sîya-

setê ma ê nijadperest û qirkerî ra dûrî bikewê û ma do peynî ro îqtîdarê to biyarî. No peyamê înan Erdogan zaf tersna. Erdogan neçar mend di rayan ra yew qebûl bikero. Ya do fek îqtîdarê xo ra verado û ya zî do fek reforman ra verado.

Erdogani 22ê aşme de, qalkerdişê kongreyê partiya xo de qerarê xo eşkera kerd. Sey her rayan îqtîdarê xo esas girewt û reforman ra fek vera da û rapey gam eşt. Şirikaniya xo ra ozrê xo waşt û spasiyê înan kerd û vat qisur meewnê, şima ez şaş fam kerda. Reformî falan çiyêk winasî çinî yo, eke bibo nê qabê muxalîfanê ma yê zerî yê, tena mi waşt qabê ameyîşê pereyan û xapênayîşê Ewropa qalê reforman bikerî. U vat, qet meraq mekerê ez nêverdena kurdî nefes bigerê, ez têkşîyayîşê xo yê Kobanê xo vîrî nêkena. S. Demirtaşî vera nêdana, ez Gezi xo vîrî nêkana û O.Kavalayî vera nêdana. Erdogan endêk tersabî ke qabê ke verê zerîyê Bahçelî bido û ey şad bikero bi ser de dost û hevalê xo ê herî qedîm Bulent Arinç zî kerd qurban. Her helda enî bes nêkerdî 25ê aşme de Erdogani xeta înkârî esas girewt û vat pirsgirêka kurd çinî ya. Yanî vat kurdî çinî yê.

Asîyeno ke şiyayîşê Erdogani ê ser xeta faşistî ê qirker rihet bî, la ageyrayîşê cey do qet rihet nêbo. Erdogani bi destê xo qemçikê xo da yo destê înan û destê înan kerdo qirikê xo. Heta Erdogani nêfetesnê qirikê Erdogani vera nêdanê. İradeyê Erdogani destê înan de yo. Erdogan biwazo zî henî nişikeno sîyasetê xo bibedelno û reforman virazo.

Erdogan qabê têkberdişê kurdan şî xeta înan ser û înan dir werê ama la o bi xo têk şîyo. Henî nêşikeno qemçikê xo destê înan ra bivejo û xo înan ra bixelesno.

Kalikanê ma bilasebeb nêvatê 'Derdo ke merdim biyaro serê xo dermanê mîyanê ma bixerepnê û sîya-



Dewey Ma

Cemil Oguz

cemilo@diyarname.com

'Destê Homayî'

Vatişê verînan o, "Wa destê Homayî paştîya to de bo". Wexto joy qeybi joy binî başîke waştêne ana vatêne. Zehfê cê zî dadiyan qewbî tutanê xo vatêne "Wa destê Homayî paştîya to de bo."

Tutekê bibî, cayke dîrê, babî feqîr, keyede nîzdê dûzîneyke tutî. Ê ma zî zehfê keyan de endêke tutî bibî.

Wexto o hema qickek bî, şahiyê rojbîyayîşê cê de goge (tope) zey dîyarî ci rê hamî. La ê tutanê ma qe gogey cînan çinêbî. Tutanê ma naylonî yan zî potî kerdêne tîmîyan, ê kerdê gilor û pê goge kay kerdêne.

Ê baş goge ramitêne. Wexto goge kewt verê lingey cê zewgir lingewa bizeleqîyo te ra nêbine û ana ramitêne. Zehfê tutê ma zî bibî goge zehf weş ramitêne.

Goge de asîst muhîm o. Ê baş asîstî kerdê. Ez rehet eşkena vacî ke zehf tutê ma zî bibî baş asîstî kerdêne. La siûdê înan çinêbî.

Yê rêzey yewîn de Armanda Diego Maradona wo, yê dimara yenê zî tutê kurdan.

Erê babê ê feqîr bî, la welato ke wayîr ro ci veciyo bibî. Yê tutanê ma jo ke wayîr ro înan veciyo çinêbî û enka zî çinîyê.

Her dadî tutê xo ra vatê "Wa destê Homayî paştîya to de bo" la ti wextî destê Homayî zey alîkarî nîyame paştîya tutanê ma û nêgirot. La yê Maradona destê Homayî hame û pê kupa da qezenckerdişî.

Erê Diego Armando Maradona roja 25.11.2020'an de qelbê cê reya peyîna da pero û vindert. Hendî Maradona ene dinya de nîyo. Maradona şî. A Maradonayo ke lehengê tutanê ma, lehengê zehfê tutan bî. A Maradonayo ke qic, pîl, her kesî bi kêf ro maçanê cê temaşe kerdêne.

Serra 1986'an de Turnuvaya Kupa Dinya dewam keno. Arjantin çarîk final de İngilistanî reyde kay keno. Maradona bi formaya xo ya 10 nimray kaydewo. Kaykerdoxê Arjantinî asîst keno, Maradona çildano û bi serey xo dano goge ro û beno gole. Erê ma vanê qey bi sere dawo pero la a çaxî destê xo zî kerdo berd û bi dest dawo pero. Helbet tay îtirazî benê la jo baş fam nêkeno, hakemî zî baş nêvînanê û gole serê namey Arjantinî de yena qeydkerdişî. Zehf dimara re serê mesela de yeno xeberdayîş, vatişê "Destê Homayî" vecêno meydan û a gole zî zey goley bi "Destê Homayî" kuna mîyanê tarîxe.

A maçe de çikew bîn zî beno: Maradona natê xêze, hetê sehay xo de wo. Goge resena ci û ew vaz dano, dewrê 60 metre vaz dano, 7-8 kaykerdoxan derbas keno û golêk bîne erzeno. Bi ene gole Arjantin bi 2-1 paştîya İngilistanî nano erd wa û dima ra nîm final û final. Arjantin maçey finalî de bi 3-2 zorê Almanaya Rojavanî beno û Kupa Dinya gêno. Maradona ke a serrî super kay kerd bî, golê eştîbî Xelata Goga Zêrine girot û serey 2002an de FIFA a goley Maradona ke 60 metre goge ramitebî û gole eştebî "Zey Goley Seserre" qebûl kerdê.

Heta Maradona dest bi kokaîn nêkerd her destê "Destê Homeyî" paştîya ê de bî. Belkî rojêk Destê Homayî serê paştîya tutanê ma de bo zî.

Ma Maradonayo ke zewqê goge da tutan, pîlan û heme temenî de însanan, oxir kerd... Cayê şî zî wa Destê Homayî paştîya ê de bo.





Tu bi çî rûyî bacê dixwazî!

Li Dêrika çiyayê mazî, sê hevalên ku gelekî ji hev hez dikirin hebûn. Wan dawîya hefteyê ereq û goştê xwe di-birin û diçûn ser textê qîza qiral. (Textê qîza qiral li pişt Dêrikê di nivê çiya de ye, hêja ye ku mirov li wê derê rûnê û li Dêrikê temaşe bike. Dibêjin qîza qiral nexweş ketiye û wê birine ser wî textî, li wê derê baş bûye.)

Evan hersê hevalan goştê xwe dipêjin û dest bi vexwarina ereqê dikin. Dema ku hinekî serxweş dibin welatparêziya wan tê bîra wan û li ser damezirandina Kurdistanê dik-evin nav nîqaşan. Di nav du sê saetan de Kurdistanê rizgar dikin. Piştî ku Kurdistanê rizgar dikin, erkên xwe jî diyar dikin.

Yek ji wan dibê serokomar, yek dibê serokwezîr û yê sêyemîn jî dibê wezîrê karê aboriyê. Jixwe ku mijar aborî be nakokî bixwe derdikevin holê.

Wezîrê karê aboriyê jî wan re dibêje, binêrin divê em Kurdistanê bikin wekî bihuştê lê pêdivî bi pereyan heye, divê hûn baca xwe bidin.

Li ser bacê li hev nakin û pev diçin. Serokwezîr dibêje; ma li Kîjan welatî serokwezîr bacê daye ku tu ji min dixwazî? Serokomar dibêje tu bi çî rûyî ji min bacê dixwazî?

Werhasil di vî şerê dijwar de, serokwezîr jî textê qîza qiral dikeve û piyê wî dişikê. Piştî heyvekê dema ku diçe saziya lê dixebite, hevalên wî jê dipirsin, piyê te çawa şikest? Serokwezîr bersiv dide wan û wiha dibêje; di çalakiya rizgarkirina Kurdistanê de şikest.

Riza Uyar

Tiştanok (mamik)



1- Mamê mino mamani
Bi min re radibe
Bi min re rûdine
Hinga diçe nagihimê.
Kî dizane ev çî ye?

2- Mamê mino mamani
Bi pel û strîn e
Li ber dilê bilbil şîrîn e

3- Mamê mino mamani
Bi pişt e bê zik e
Bi dest e bê ling e
Bi dev e bê diran e
Bi çav e lê nabîne

Çavkanî:
Mamikên Botanê
ji berhevkariya
Rênas Xendekî û
Dildar Botî

Bersivên me ev in:

- 3- Meşk
- 2- Gul
- 1- Si

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Em bi hêvî ne ku li gorî dilê we bin. Bi malbatî dîsa van mamikan ji hev bipirsin û tasekê ji kaniya da û dapîran, bav û bapîran vexwin. Tiştanok bi gotina 'mamê mino mamani' dest pê dike.

Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin. De werin em dest pê bikin û pîrsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
Girgeşkur xweş girgeşkur


→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
Havîn hat tişt û mişt
Payîz hat li ser rûnişt
Zivistanê got; ka te çî ji min re hişt?

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:
Heft elb mast, heft elb tas

Çavkanî: Pitrukê Zûgotinok a ji berhevkariya Mihemedê Kurdo



XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Navçeyê Amedê 3. Alaveke ku berê pê ava xwe dicemidandin
5. Kurdên ne misilman 6. Bi serbestî bikaranîna mafekî
7. Binê lingê sewalên wekî pez, hesp, çêlek û hwd
9. Cihê ku pûş an jî zad lê tê danîn û hilanîn 12. Çûna hecê ya ne di dema xwe de
14. Celebek ji darên Kurdistanê 15. Paytexta Tirkîyeyê 17. Kurtasiya navê Yekitiya Ewropayê
18. Xwedawendekî Mîsra kevin 22. Şandî, qasid

JI JOR BER BI JÊR

1. Raz, tiştê veşartî 2. Rih, can
3. Cih û war, her wiha livîn
4. Mûyê li bin çena zilaman
5. Danekî rojê
7. Welatekî Ewropayê
8. Rengêk
10. Îca, ji niha şûn de
11. Heskirin
13. Êl
14. Paytexta Libnanê
16. Bela, felaket
19. Ji nişkan ve
20. Endamekî laşê mirov, ger raweste jiyana mirov bidawî dibê
21. Cînavka pirsîyariyê
23. Noteke mûzîkê

Bersiva hefteya borî



Dengekî bisêhr 'Mem Ararat'

Dogan Hejar

Hêdî hêdî xewê hişê min dîl digirt lê min hêj li ber xwe dida. Di guhên min de ber-guhk, min li radyoyeke kurdî guhdarî dikir ku li Stenbolê weşan dikir û hin caran bi zelalî di nav dîwarên sar ên zindana Tekîr-dagê de jî dikişand. Her çî qas derengiya şevê bû û stranên li gor dilê min derneke-tibûn jî min nedixwast radyoyê bigirim. Di wê kêliyê de ku êdî laşê min xwe radestî xewê dikir, dengê newayêke efsûnî ji ber-guhk hat û bîstek bi şûn de jî dengê pir aşîna lê ew çend jî nedîde bi gotina "li wargehên evînê" ket guhê min.

Xew di wê kêliyê de têk çûbû û min deriyê bîra xwe heya dawiyê vekiribû da ku gotinên stranê ji ber bikim lê têr nedikir, diviyabû min binivîsanda jî. Min bîlez û bez bêyî ku roniyê vekim, destê xwe avêt pênûsdankê, pênûsek jê girt û li rex ranzeyê romana ku min heta de- rengiya şevê xwendibû hilda û weke lînûsk bi kar anî. Di rewşên wisa de heqek mirov heye, lewre ger gotin neyê fêmkirin heya careke din heman stran di radyoyê de derkeve û mirov rast lê bê peydakirina gotinên wê ne gengaz e. Ji ber wê heya jî min hat, min hewl da gotinan rast fêm bikim. Ger di hîcroka min de heval tunebûna, min ê jî bo jîbîrkerîna di wê wextê de rahiştta tembûra xwe û heya di bîra xwe de bi-kola ez ê nesekiniyama.

Piştî stran qediya, bi hêviya newaya

Min bîlez û bez bêyî ku roniyê vekim destê xwe avêt pênûsdankê pênûsek jê girt û li rex ranzeyê romana ku min heta derengiya şevê xwendibû hilda û weke lînûsk bi kar anî û min hewl da gotinên wê strana xweş binivîsim

wê ji bîra min neçe, min li hember xewê ala spî bilind kir û ez razam.

Sibetirê, dema bi dengê deriyên şiyar bûm ev gotin di serê min re der-bas bû "ew çî bû, çî awazek bû". Min roman vekir, nivîs ji ber ku di tariyê de hatibû nivîsandin nedihat fêmkirin û ji newaya stranê bi tenê nakarata "dil di-soje" di bîra min de mabû. Êdî jî bilî du-bareyê, rasthatina stranê rêyeke din nemabû.

Min ê ku digot, guhdariya li radyo û temaşeya TV'ê ya zêde ji bo xweperwer-dekirinê astengiyên mezin in, ji wê rojê bi şûn de ji hergavî bêtir bûbûm bihîzerê pêlweşê. Li gel pêlweşê her tim pênûs û lînûska min a stranan amade bû.

Piştî rojekê ne ew stran lê belê straneke din a heman kesî giyana min dilerî-zand "li deşt û çîyan, li zozanan, li gund û li bajarên" û rojêke din jî bi strana "Zana û Andoq" dibû mêvanê hîcroka me. Min hê navê xwediyê wî dengê bisêhr niza-nîbû û di axaftina telefonê yekê ya bi malbatê re, min ji kekê xwe pîrsa huner-mendekî nû ku li gel tembûrê stranên xwe dibêje kiribû lê wî jî tê dernexistibû ku ez qest û alaza kîjan stranbêjî dikim.

Demeke dirêj bi meraq û tatêlê bo-

riya û rojekê di rojnameyê de li gel wê-neyekî wî nivîsek der barê wî de hebû. Ez êdî him bi navê wî hesiyabûm û him jî min ew dîtibû: Mem Ararat.

Belê Mem Ararat bû, yê bûbû dengê

"rêwî"yên bi dehan sal in ji bo welatekî azad bi rê ve diçin; ew bû qîrîna sot û soja dilên bibirîn û ew bû vegotina "bîra-nîn"ên divê qet ji bîr nebin...

Niha albûma xwe ya nû ya bi navê

Pesna Evînê derdixê, her hefte strane-kê diweşîne. Bi sedhezaran hezkiri-yên wî ji bo guh bidin stranên wî yê-nû, roj û saetan dijimêrin. Mem navekî din ê serkeftinê...



Li ser jiyana Mihemed Arif Cizîrî çend pirs

Mefer Kurdil

Me der barê jiyana hunermendê hêja Mihemed Arif Cizîrî de, bi nivîskar Konê Reş re sohbetek kir û xwest derheqê ji-yana hunermend Mihemed Arif Cizîrî de çend tiştên taybet ên li ser torên civakî hatine belavkirin ji Konê Reş bipirsîn. Me xwest, ew Mihemed Arifê ji aliyê gelek kesan ve bêtir weke stranbêjê eşqê û tenê li ser dilan kilam gotine der-dikeve pêş, bi çend pirsan ji kilam û stranên wî wêdetir li ser ked û hezkirina wî ya kurdî û welêt bisekinin.

Botan keleha ziman bû

Der barê vê mijarê de Konê Reş wiha dibêje: "Mihemed Arif Cizîrî an Cizrawî, ew ê beriya 108 salan (havîna 1912'an), li bajarê Cizîra Botan, li taxa Mîr Elî çêbûye. Wek tevahiya zarokên Cizîra Botan, ji bav û kalên xwe, fêrî çî-roka Memê Alan û serboriyên Mîr Bedir-xan û kurên wî bûye. Li gor biryara Mîrê Botan, lazim e her kurdê bajarê Cizîra Botan straneke kurdî bizanibe.

Anku bajarê Cizîra Botan ji mêj ve ke-leha ziman, ferheng û rewşenbîriya kurdî ya giştî ye. Ji ber kurdewariya xelkê wê, di heyama komara Kemalî de, bi tundî şerê wan hat kirin. Di sala 1925'an de, piştî têkçûna şoreşa Şêx Seîd Efedî li Diyarbekirê, Mihemed Arif jî bi gunehê kurdewariyê digel gelek kesên Cizîrê hat girtin û zindanî-kin û çar sal ji temenê xwe di zindana Amedê de derbas kirin. Anku dikarim bibêjim; girtina wî politîk bû."

Di 13 saliya xwe de tî girtin

Nivîskar Reş derheqê zindanîkirina M. Arif de van agahiyan dide me: "Ez ni-zanim kî pê re hatibûn girtin an îdam kirin û temenê wan çend bû. Tiştê ez di-zanim hingê temenê M. Arif 13 bû û dema ew di 1928'an de, bi efûya giştî serbest tê berdan temenê wî 17 ye. Belê ew bi efûya sala 1928'an, ji ber te-menê wî yê biçûk tê berdan."

Koçkirina ber bi Duhokê ve

Konê Reş ji bo koçkirina M. Arif a ji

Cizîra Botan van agahiyan bi me re parve dike: "Piştî ku ji zindanê hatiye berdan vegeyriyaye Cizîrê. Ji ber heja-riyê, berê xwe daye herêma Badînan, bajarê Zaxoyê. Li vir zêde nemaye, çûye Duhokê û bûye yek ji xelkê wê. Li Duhokê û derdora wê wek hunermend kar ki-riye. Pêre jî di koç û diwanên axa û began de stran gotine, piştî rewşa wî pak bûye, ji xwe re dikanek wek resto-rantekê li Duhokê vekiriyê."

'Min bike bilbilê Kurdistanê'

Me xwest em rastiya vê gotinê ji Konê Reş bipirsîn û bizanibin gelo bi rastî jî diyalogek wiha di navbera M. Arif û nemir Barzanî de derbas bûye ku tî gotin, "Mihmed Arif ji Mele Mistefa Barzanî re dibêje min bike bilbilê Kur-distanê" û Mele Mistefa jî dibêje, "Kuro Mihmed Arif stranên te her tim li ser eşq û meşqê ne. Te carekê li ser eşqa Kurdistanê straneke negotiye, heya ez te bikim bilbilê Kurdistanê."

Konê Reş ji bo vê diyalogê wiha ber-siva me da û got: "Li gor ku min bihîs-

tiye kêfa Barzaniyê nemir ji kultura ci-vakî re dihat, her wiha ji deng û stranên Mihemed Arif re. Min jî wek we ev çirok bihîstiye; min bihîstiye ku Barzanî bi he-nekî lê vegeyrandiye, 'tu bilbilê Xifê yî'. Bi baweriya min, ev gotina Barzanî ne bi wateyê ye ku ew ne bilbilê Kurdistanê ye. Ji ber ku Mihemed Arif Cizîrî li ser Kurdistanê stran gotine. Wek vê stranê ku pesnê PDK dide: Partî me partî me, esasê xwe partî me, lê yadê lê yadê, Bextê te me tu bêje, ro derket ji Bex-dayê, şewqa xwe da dinyayê, şer ketiye Kurdistanê, şer kiriye Barzanî, partî me partî me, bûm lawikê partî me. Ma ev strana wî ne li ser Kurdistanê ye?"

Tiştên wek hev tî bîra mirov. Care-kê rehmetiyê Seîd Yûsif ev serpêha-tiya xwe û Dr. Kamîran Bedirxan ji min re got: Di sala 1971'ê de Mîr Dr. Kamî-ran Bedirxan ji Parîsê hat Beyrûdê. Ez jî, di nav kurdên Libnanê de çûm pêşaziya wî û em di civata wî de kom bûn. Dema ku kêfa xwe ji min re anî, yekî ji civatê jê re got, Mîrê min! Seîd Yûsif stranên ne-teweyî nabêje. Mîr Kamîran beşişî û lê vegeyrand: Kurê min! Dema dibêje; Girê sîra bi sîr e, ew Kurdistan e."

Xwedîderketina li hunermendan

Der barê rewşa xwedîderketina li hunermendên Kurdistanê jî Konê Reş wiha dibêje: "Di baweriya min de ev yek li rewşa Kurdistanê a jeopolîtîkî vedigere; dagirkirin û parçekirina Kurdis-tanê. Wek ku hûn dizanin, her parçeyekî Kurdistanê di pîkola serxwe-bûnê de ye. Hîn ew aramiya ku em li navdarên xwe ji stranbêj û dengbêjan xwedî derkevin nehatiye. Heqê tevan heye. Li vir dipirsim gelo guhdana ku bi navê Mihemed Arif hatiye kirin, wilo bi navê Gerebêtê Xaço, Kawîs Axa, Elî Merdan, Tehsîn Taha, Miradê Kinê, Şa-kiro û yên di bejna wan de hatiye kirin? Sebaretî guhana bi navê Mihemed Arif


Holek bi navê wî li Duhokê hatiye avaki-rin û peykerê wî li ber dergehê wê holê bilind xuya dike. Hem jî du pirtûk li dor jiyana û stranên wî hatine çapkirin. Yek ji rex mamoste Segvan Abdulhekîm ve bi navê, Mihemed Arif Kewê Resen e, yek ji rex mamoste Ehmed Cizrawî ve, ew jî li dora stran û hunera wî ye. Xwezî me karîba li dor hemû stranbêj û navdarên xwe pirtûk berhev kiribana."

Mihemed Arif û evîna ziman

Konê Reş li ser evîna welat a Mihe-med Arif wiha dibêje: "Dikarim wilo bi-bêjim; her miletek bi navdarên xwe tê naskirin û dîroka gelan li ser piştta nav-daran tê avakirin; çî di warê şer û cengê de be û çî di warê zanîn û pênûs û xamê de be. Mihemed Arif Cizîrî jî yek ji wan navdarên me ye. Di heyama ku zimanê kurdî qedexê bû, kesî newêrîbû bigota ez kurd im, wî 50 salên jiyana xwe ji bo gotin û strana kurdî ya orjînal terxan kir û gelek berhemên ji folklorê me ji talanê parastin. Erê ew bû yê ku di mercên dijwar de, bi dûv gotina kurdî ya resen de dibeziya, ew gotin di tûrêkê xwe de diparast û tovê wê di nav gel de belav dikirin."

Sebaretî min û Mihemed Arif dika-rim bibêjim; her ku bîna min teng dibe û xwe di nav tenêtiyê de dibînim, li ko-vara Hawarê ya mîr Celadet Bedirxan an li diwana Melayê Cizîrî vedigerim û pê re jî li dengê Mihemed Arif Cizîrî guhdarî dikim. Bi xwendin û guhdarî-kinê re bêhna min derdikeve; ew tenê-tî û valahiya ku ez tê de me, ji hev belawela dibe û her roj lê guhdarî dikim.

Xweş li bîra min e, di sala 1968'an de, ez di qonaxa amadehiyê de bûm. Dema ku M. A Cizîrî hat Qamişloyê û li seyrangeha Gerbîs ahengek gerand, di wê ahengê de gelek stranên xweş gotin. Heta niha, ew hatina wî di nav bîranî-nên xelkên bajarê Qamişloyê de ye."



Mihemed Arif Cizîrî

Zêr zane zor zane devê tivinga mor zane!



Keştiya Alalû
Agît Yazar

Roj çûye ava. Em li navenda bajarê Dêrsimê, li devê çemê Mûnzûrê, li mekanekî xewle rûdinên. Mekan, di nav daristaneke kulx û darên sedsale de bû. Ji nav daristana kulx, şîreşîra mehşerî ya teyrikên ji hev cuda, qiyamet radikir

...Em heta ber bi êvara teng ve jî li ser keleha Pertegê digeriyan. Ji nişkan ve keştî bi dengê hêla li tûtika xwe dixîne. Orîniya keştîyê, fena orîniya gaboxeyekî gewî û ew çend jî hêrsbûyî li ser rûberê ava bendavê ya Kebanê belav dibe. Diyar bû qaptanê keştîyê êdî zivêr bûbû. Me jî nola leza bizûz xwe ji kelê bera jêr de. Me malavayî li qaptanê keştîyê kir. Mala-vayiya me jî bi qasî tûtika keştîya qaptên ew çend qerase û jidil bû.

Keleheke Xaltîyan a din jî li çiyayê jora Pertegê hebû lê wextê têr nekir em derkevin li ser wî çiyayê bilind. Ez di dilê xwe de dibêjim, de bila ev keleha hanê jî bimîne ji careke din re û em ber bi Dêrsimê ve dikudîne.

Çaxa em di ser wê pira Gulistan Doku ya cara dawî li ser wê hatibû xuyakirin derbas dibin, henase li min diçike. Wênayê serbazê tecawizkar ê bi navê Mûsa Orhan li ber çavên min diçe û tê. Xwedê! Ez nizanîm bê ka me çi xerabî bi te kiriye!..

Roj çûye ava. Em li navenda bajarê Dêrsimê, li devê çemê Mûnzûrê, li mekanekî xewle rûdinên. Mekan, di nav daristaneke kulx û darên sedsale de bû. Ji nav daristana kulx, şîreşîra mehşerî ya teyrikên ji hev cuda, qiyamet radikir. Wîwêwîta çivîkên biçûk, tev li qixeqixa teyrên mezin dibû û senfoniyekê ji zimanê xwezayê li hev digofîlî. Yek caran ji nişkan ve xirmînî bi daristanê diket û yekoderb bi hezaran teyr û tilûr difirîyan. Ewan teyrikan her wekî biyaniyên nola me ku li vî bajarê pîroz bûbûn mêvan, wan bisilavîne wanî bi fesal li ser serê me doş dibûn û cardin nola perçeyek ewrekî cûn ê tarî dinizilî daristana xwe ya ji wan re bûbû meskenê lûsê û careke din dest bi venûhûrandina xwe ya mehşerî dikir.

Li hêlekê şewqa lampên zer ên tîr, li ser ava çemê Mûnzûrê ditiyisî. Li hêla din jî her mekanê li qiraxa çem, sewta stranbêjên dêrsimî, tev li wîlewîla teyrikên nahs ên bê fesal dibû lê ewan teyrikan tevdekan bi zimanê xwe dixwendin. Sed mixabin, pirên stranbêjên dêrsimî ne bi zimanê xwe, bi zimanekî biyanî distrandin.

Me pê nizanîbû ka gelo bêşik em di wî şewlê Mûnzûrê de, li mekanekî xewle rûniştînin, yaxwud em di nav meselokên pîrejineke çirokbêj de ne.

Ji ekîba me hevalek li naseke xwe ya ji Dêrsimê bû geriya. Haha ma, qîzeke ciwan, bejinkurt, ji nav dar deviyên mekanê em lê rûniştîbûn, derket hat. Qîzika dêrsimî, di nav kiresekî sor ê gulgulî de, nola gilokek pembo dixuya. Bi vekenîneke nola pişo nermik, ber bi maseya me ve hat û destê xwe dirêjî me kir: "Selam! Ez Pinar..."

Çaxa Pînarê şîrnok destê xwe dirêjî me dike, te digot qey dilê xwe jî daniye li ser kefa destê xwe; ewqas ji dil bû. Heke meriv şerm nekira, meriv ê ew ji xwe re daniya ser masê û nola kîvroşkeke kedî ji xwe re pê şabiba. Xwedêyo. Merivên dêrsimî çiqas ji dil in, çiqas henûn in û çiqas xerîbdost in!

Sibê êvarê, hina Pînarê dela e. Roja dîtîr jî daweta wê ye. Hemû kar barê daweta xwe daye alîkî, hatiye bi me re eleqedar dibe. Piştî em çayêkê duduyan bi hev re vedixwin û şûn ve, Pînar nifteyekê dirêjî me dike, dibêje: "Cihê

hûn ê îşev lê bimînin, filan der e" û em tevra dibin. Li rabûnê, ez têderdixim Pînarê ku çaxa vedikene kulîlk li ber kenê wê şîn tê, destekî wê seqet e. Çizîni jî dilê min tê. Xwedê! Ma meriv ve ferîşteyê ji destekî wê mehrûm dihele?

Çaxa em ji hevdu vediqetin, Pînar ji me dipese: "Sibê hûn ê bi ku de biçin?"

Em dibêjin, em ê herin bajarê antîk ê Ribatê.

Pînar li me vedigerîne, dibêje: "Li xwe miqate bin. Ez û destgirtiyê xwe yê ku sibe ne du sibe em ê bi hev re bize-wicin, li cihekî wanî em ji xwe re derketibûn seyrangehê. Em ji hêla sîhayan ve hatin bombabarankirin. Em ji mirinê filitîn. Ez ji destê xwe birîndar bûm. Bînerin! Ev destê min ji wê bombardûmanê wanî seqet ma."

Li min wa hat, min got qey guleyek li serê min ket û pîstika mejûyê min ji hev belav bû. Gava Pînarê qala wê karresata bi serê wê de hatibû dikir jî lê dîsa jî çiçekek ji vekenîna li ser rûyê wê kêm nedibû. Ma ez çi bibêjim Pînarê delal!? Bila ev çend reşbelekên hanê, diyariya min bin ji bo daweta te karxelal û te qumriyê be!..

Çûyîna Ribatê

Ev bajarê antîk ê Ribatê 30 km li başûrrojaya Dêrsimê ye lê bi fira teyrekî, ango di riya çolebir re derdora 10 km dûrî Dêrsimê ye.

Li du-sê cihyan me riya xwe wenda kir. Di rê de em di kêleka çend gundan re derbas dibin. Gund jî hema çî gund! Ji her gundekî du-sê mal an lê hene yan tune ne. Li wan malên heyî jî bedîademiyek lê nayê dîtî. Ji bo em riya Ribatê bipirsîn, em li ber malekê disekinin. Kesek xuya nake. Li ser navê giyandaran tenê em çêlekek bi dareke mazî ve girêdayî ye dibînin. Gava pêjna me bi ser çêlekek dikeve, di ser hustê xwe re difitîle li me dinêre. Gurzek rêsi di devê wê de wanî zîq li me dinêre. Gurzê rêsi, wanî nola zir-simbêleke terikî di vî alî û li wî alî devê wê re pijiqîbû der. Xwedê dizane tiştêk ji me neket serê çêlekekê. Loma jî piştî nivbîstîkekê veket bi bêminetî û wilo jî bi bêxemi hêdî hêdî devê xwe li hev bir û anî û li gurzê rêsiyê di devê xwe de likijî.

Hasilîkelam bi duayên derwêşan, bi tîrên gamêşan dîsa em li ser riya xwe ve dibin. Heta jorê em diçin. Paşê tabelayeke gupayî û zingarokî derdikeve pêşberî me. Berê tabelayê li çolbeyariyê bû. Kêleka wê ya gupayî jî li riyekê berbîjêr ve bû. Em jî bi gura kêleka wê dikin û ber bi newalê ve berjêr dibin.

Rê, li bin darên tûyan ên sedsale diqede. Her darekî wan darên tûyan, hezar pez dikarîbûn li bin siya wan mexel bihata.

Di nav çavên daran re, tenê du mal dixuyên. Ji mala nêzikî darên tûyê, zîlamê derdikeve te me pêşwazî dike. Piştî silavdayîne ez navê zilê min dibim, navê wî Elî ye. Piştî ez navê kûçikê Elî yê li ber siya tûyê ramedandî dipirsim, navê kûçikê wî jî Hirço ye. Heta ekîb qamerayên xwe û alavên xwe yên din derdixin, ez bi Elî re jî û bi kûçikê wî



Hirço re jî dibim dost û tew ez bi Hirço re çend selfiyan jî dikişînim.

Bajarê Ribatê yê antîk

Di sala 2013'an de zanîngeha Eren a Bedîsê li keleha Ribatê dest bi kolandina arkeolojiyê dike. Di encama vê kolandinê de, li herêma Dêrsimê cihê arkeolojîk ê herî mezin tê kişîfkirin. Firehiya qada cihwarbûna keleha Ribatê, bi qasî sê qadên fitbolê mezin e.

Keleha navendê li ser kelateke bilind a di sêkuçikiya sê newalên kûr de ye, hatiye avakirin. Tunelek di zikê tahtî de kolandine û derketina li serê kelehê, encax bi wê tunela bi pêpelok mimkûn e. Tunela xetimandî jî ji bin vê tunelê xwe berdide heta devê çem, tê dîtî. Li ser lûtkeya kelehê, cihê agirgedehê heye. Ew agirgedeh, bi mebesta îşaretê bide kelehên li derdora Mazgîrtê, hatiye bikaranîn. Kelehên li derdora Mazgîrtê bi qasî 40 km dûr e lê dîsa jî bi çav tê tevsilandin. Di asgehên derdorê de, gelek tîrbên bîrdarî, di tahtî de hatine kolandinê dîtî. Dîsa pireke nola bazinêkî heye. Piştî sê hezar salan hîn jî li ser piya ye. Di berdewamiya pirê de, riya ji kela Ribatê dest pê dike, heta keleha Tûşpayê diçe tê dîtî. Niha ev pira Xaltîyan, yekane derbasoka ji bo pezkoviyên besil ên herêma Dêrsimê ye. Restorasyonêke pir baş jî vê pira dîrokî re ferz e. Yan na, ew ê di demeke nêzik de hilweşe û wênekêşên xwezayê, ew ê nema bikarbin wênayên niwaze yên ku dema pezkovî li ser vê pirê poz didin wan bikişînin û raberî hezkiriyên xwe

yên xwezaparêz û dîrokhez bikin.

Ribat, bi mebesta hilberîna sîlehên cengê yên hesin hatiye avakirin. Ev bajarê antîk, li derdora sê hezar sal berê jî hêla pêşiyên kurdan Xaltî-Ûrartûyan ve hatiye çêkirin. Bê çawa roja me ya îroj, dewleta super hêzdar a Amerîkayê li herêma 51'emîn sîleh û teknolojiya herî pêşketî, bi awayekî veşirtî hildiberînin. Çima veşartî? Lewra neyarên DYA'yê ango Dewletên Yekbûyî yên Emerîka, henin. Ev dewletên neyarên Amerîkayê, yên wekî Rûsya û Çînê hene û Amerîka naxwaze ev dewletên neyar ên super hêzdar bi sira wan bizanibin.

Ger em derkevin rêwîtiya dem û dewranan/time travel, sê hezar sal berê li Mezopotamyayê dewleta Asûr a super hêzdar hebû. Heta meriv dikare bibêje ev dewleta Asûr, xezeba xwedê bû! Lewra, ev dewleta hanê ya Asûrê jî qewmê samî, mîrasxwirê Akadiyan bûye û akadî jî li derdora çar hezar û 250 sal berê jî parzemîna Afrîkayê hatine xwe li welatê Gûtî û Somerên hevniyad girtine. Gûtî û Somerî, hevniyad in ên niştêcihên zagrosî yên bingehîn in lê Asûrê samî, di nav demajoyê de dibe sebaba têkçûna gelek şaristaniyên pêşiyên kurdan ên wekî Gûtî, Somerî, Mitani, Hitîti û Xorri/Horri.

Eşîrên van şaristaniyên pêşiyên kurda yên ji ber xezeba Asûrê samî filitîbûn, tevdekan wan li welatê sar ê jorîn, ango li Serhedê îro li hev dicivin. Yê pêşengiyê jî wan re dike û tifaqa yekitiyê di navbera wan eşîran de pêk tîne jî mîrê Xaltîyan ê bi navê Lîtûbrî yê zanemend ê bavê Sardûriyê yekem bûye.

Piştî vê tifaqa xurt a di navbera eşîrên kurdên hingê de, êdî pergala dewletbûnê tê avakirin. Ji xwe re li dor oleke neteweyî dicivin û motîve dibin. Navê seryezdanê wan jî Yezdan Xaltî bûye. Paşê li derdora Xarpêt, Çewlik û Dersimê lanê hesin kişîf dikin. Bi vê kifşa nêzikê re, serdemeke nû dest pê dike: serdema hesinî! Di cihanê de cara ewil pêşiyên me

Xaltî hesin dibînin û hildiberînin. Heta ji wan tê, hilberîna hesin, nola eyaleta Amerîka ya 51'emîn Xaltî jî li deverên nepen û xewle dest bi hilberîna hesin dike.

Dîtina Asûrê gewî dibîne ku Xaltiyên neyarên wan, sîlehên ji hesin hilberandiye lê di destê Asûran de jî sîlehên cengê yên brons hebûn û Asûran dikir nedikir, nikarîbûn bi sîlehên hesin re şer bikin. Gava şûrê hesin li şûrê brons diket, şûrên birons dibû du qet lê xumûm nedihat li ser şûrê hesinî. Bi vî awayî 300 sal, Asûran nikarîbû zendê Xaltîyan bitewanda.

Piştî Xaltîyan jî û heta sed sal berê jî ev sê hezar sal in ku benîademî miqîm hesin, ji wan lanê hesin ên Ribatê hildiberandin.

Gava em li nav kavilên Ribatê digerin, ji her çend gavan em li seriyek keşala hesinê nivhelandî rast dihatin. Ez bi xwar ve tîmê radihêlim perçeyek hesinê nivhelandî. Hesinê jî ber destê hosteyên Xaltîyan maye, ez di destê xwe de dibim û tînim. Di xeyalên xwe de ez ewil diçim muzexaneyê Wanê ya Xaltî-Ûrartûyan. Şûrekî Xaltîyan li muzexaneyê Wanê hebû. Li ser wî şûrî bi zimanê Xaltî nivîsandibû ŞÛRÎ! Sura bayekî şîrgermî li ser min dixîne. Ez di gerîneka rabirdûyê de werdibim. Xwe di tuneleke bi şoq û lempeyên nola ronkahiya lazerê de dibînim. Ew lempeyên di rengê keskesoran de, dezîk dezîkî, tîrêj tîrêjkî li vî alî û li wî aliyê min, ji hev vedizeliyan diçerixîn diçûn û ez ber bi dem û dewranan ve kaş dikirim.

Dengê hevalên qameraman, Selcan, Apo û Zozan tê min. Dibêjin: "Mamoste êdî em hatin dawîya bernameyê. Gotinên xwe yên dawî bibêje û xatirê xwe ji temaşevanan bixwaze!"

Ez dinêrim berê qamerayan li ser min e, heval li benda min in. Ez li wî kulçeyê hesinê di destê xwe de dinêrim. Bi mebesta xatirxwestinê jixweber ev gotina pêşiyên ji devê min dipeke: zêr zane, zor zane, devê tivinga mor zane!